

## Guleyên hêviyê

Zelîxe: berê xwe dabû êgir; ji navçeyeke bajarekî eşîr û axayan, ji ber lêdana ku bavê wê li dayika wê dikir, ji ber ku çavdêriya jinên derdorê dikir û didît ku hemû hevparên qedereke nikarin biguherînin bûn, ji ber ku ne xwediyê jiyana xwe bû... Derya Ozdem r / R.2



## Raperîna ku qet venemirî

Dema ku em agahî û gotegotên heya roja me ya îro hatine di bêjingê re derbas dikin, em rastî gelek jinan ku di çaxên cuda de, nexasim di qadên wêjeyê de rolên girîng lîstine, tên. Wan di coş û xiroşa dîrokî de, li ser jiyan û evîndariyê nivîsiye... Zehra Mohammedzadeh /



## Rewşa jinên êzidî...

Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî (Amnesty) der barê jin û zarokên ji destên çeteyên DAIŞ'ê hatine rizgarkirin, bi sernavê “Mîrateya Terorê: Rewşa Xirab a Zarokên Êzidî Yên Ji DAIŞ'ê Rizgarbûyî” amade kiriye û ragihandiye... ?aswar Mame / R.8

Rojnameya Heftane

# xwebûn

www.xwebun.org

17-23 Tebax 2020

Hejmar: 35

Buha: 4 TL

rojname@xwebun.org

# Hêviya ji siberojê

Ziman, çand û huner nasnameya mirov û civakê ye. Çand û huner bi destên hunerî xwe didin der. Nivîskar û şêwekar Fewzî Bîlge li ser ziman û şêwekariyê destnîşan kir ku şêwekariya kurdan roj bi roj pêşdetir diçe. Bîlge anî ziman ku heke pirsgirêkên siyasî çareser bibin dê huner û hunermend bêtir zemînê bibînin ku pêşve biçin. Bîlge balê dikişîne ser eleqeya ji bo şêwekariyê û bi lêv dike ku di asteke baş de ye. Ew di demên dawî navê gelek wênesazên ciwan û jêhatî dibihîze. Bîlge dibêje: “Şêwekarî hetanî salên 90'î pir hejar bû lê niha rewş ne xirab e. Ciwanên nû hêviyê didin me ku siberoj wê pir baştir bibe. Wêne û wênesazî her diçe xwe li ser vê axê dide hezkirin. Hezkiriyên wêneyan pir in lê wekî ku min got; divê pirsgirêkên siyasî bên çareserkirin. Wê demê dê bê dîtin ku kurd çiqas ji wêne û peykeran hez dikin.”...

*Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R - 4*



## Elewî li dijî projeya rantê bibertek in

Li bakurê Kurdistanê deverên dîrokî û pîroz di hedefa dewletê de ne. Ji hêla dewletê ve di bin navê cuda de mudaxaleyî van deveran tê kirin û tên talankirin. Navçeya Heskîfê ya Êlihê ku xwedî dîrokeke 12 hezar salan bû, bi vê polîtîkayê di bin ava bendava Ilisûyê de hat hiştin. Dîsa navçeya dîrokî Sûra Amedê beşeke wê ya mezin hat hilweşandin û di bin navê nûkirinê de pêşkêşî kesên nêzî dewletê hat kirin. Niha jî çaviyên Mûnzûrê di bin navê geşt û guzariyê de di hedefa delwetê de ne. Civaka elewî li dijî vê kiryarê bibertek e... *R .3*

## Nerazîbûnên şermoke

Di 11'ê tebaxê de dewleta tirk bi êrîşeke hewayî payebilind û leşkerekî artêşa Iraqê kuşt. Li dijî destwerdana artêşa tirk a li ser axa Iraqê û kuştina fermandarekî wan berdevkê artêşa Iraqê Yehya Resul bal kişand ser êrîşa dewleta tirk a li dijî fermandar û leşkerên Iraqê û wiha got: “Divê Tirkiye bûyerê zelal bike û ji bo parastina sînorên Iraq û Tirkiyeyê, sucdaran ceza bike.”... *R.6*

## Xaye çinêkerdişê civaka kurd o

Bêtehamulîya qarşî ziwanê kurdî bêtehamulîya qarşî estbîyayîşa civakê kurd o. Hukmatê AKP-MHPyî konseptê çinêkerdişê kurdan ê serra 1930'an esas gena. Êy konseptan de qirkerdişo fizikî û qirkerdişo sipê esto. Coka çar hetan ra hêrîşê civaka kurd kenê. Hêrîşê nirx û rûmetanê kurdî, çanda kurdî, ziwanê kurdî û xwezaya Kurdistanî kenê.Komara Tirkîya ser çinêkerdişê civaka kurd awan bîya... *Mehmet Şahîn R . 9*

Nameyek ji mirinŒ re... D lan Aydin / R PEL - 2



## Çand û parastin

Di pêvajoya herikîna dîrokî ya pêşketina civakbûnê de, ji hemû hilberîn û afirîneriya ji bo jiyanê re çand tê gotin... Parastina çand û baweriya xwe girîng e û di heman demê de parastina hebûna xwe ye...*Rohat Ararat R-11*

## EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ!

Gelek caran berhemên hunerî/edebî dibin zar û ziman û bîra welat û neteweyan. Hinekî din zorê bidin “xwe” rasterast dikarin bi rehetî bibin nasnameyek xurt jî… Ev taybetîya huner û wêjeyê di kûrahîya zemên de ji mirov re dibe per û bask û ber bi “ronahî”yê ve dibe. Romana Yildiz Çakar a bi navê “EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ” jî êşa birîna me ya bi sedsalan e tenê qalik girtîye lê qet baş nebûyê bi wêrekî bi me dide hesîn... *Sîdar Jîr / R - 5*

## Xwendin nivîsê ji tarîtiyê rizgar dike

Girtina saziyên kurdan ên li Bakur, bandoreke pir dijwar li kar û barên çand, ziman, wêje û hunera kurdî kir. Tevî van pêkanînan, xemxurên zimanê kurdî jî li ser zimanê xwe dixebitin. Koma Xwendinê ya Amedê jî yek ji wan xebatan e. Endama komê Xecê Daşgin diyar kir ku xwendin nivîsê ji tarîtiyê rizgar dike ... *R.11*



# Guleyên hêviyê

Derya Ozdemîr

**Zelîxe:** Berê xwe dabû êgir; ji navçeyeke bajarekî eşîr û axayan. Ji ber lêdana ku bavê wê li dayika wê dikirî; ji ber ku çavdêriya jinên derdorê dikir û didît ku hemû hevparên qedereke nikarin biguherin bûn. Ji ber ne xwediyê jiyana xwe bû û qedrê hebûn û fikrên wê tune bû...

**Serap û Nazê:** Berê xwe dabûn agir; ji navçeyeke derd û kulên wan tenê zik û berîka wan, ji ber malbata wan bêyî qayiliya wan bi zorê, her du jî nîşanî kiribûn û dikirin ew bizewicandana û jixwe sibê hina her du xwişkan bû...

**Fatme:** Ji gundekî xwediyê zivistanên dirêj havînên kurt, sermayên pir û germahiyên hindik, zor û zehmetiyên jiyanê pir bû lê ew ne xema wê bûn. Derd û kulên wê çîrokên mekapsoran bûn. Ev çîrok û xeyalên zarokatiya wê bûn, ji ber wekheviya keçik û kurikên mekapsoran berê xwe dabû êgir...

**Binevş:** Ji gundekî qerekol lê ji ber agirê bi mala wan xistibûn; îşkenceyên li wan kiribûn, ji ber ku leşkeran bav û xwişka wê biribûn û xwişka wê bi awayekî perîşan vegeriyayî lê bavê wê venageriyayî....

**Hewê:** ji metropoleke tirkan, ji ber zilm û zora li ser gelê kurd bi ser û çavên xwe didît û li bajarê ku lê ji bo pêşîgirtina vê zilmê tiştek ji dest nedihat, ji ber şerma dewleta xwe berê xwe dabû êgir...

**Janîe:** ji welatekî ewropî, ji ber nerehetiya ji rehetiya xwe, ji ber sîstema kapîtalîst û bêwekhevî, ji ber wijdanê xwe..

**Pelîn:** ji bajarekî tirkan, ji taxên feqîran, ji ber ku ew jî kurd bû lê bi salan nizanî bû û levzeke bi kurdî nizanîbû; ji ber ku zimanê wê qedexekirî bû, kurd bû û feqîr bû...

**Gulê:** li zanîngehê, di encama lêgerîn û xwendinên xwe de gihabû encama nepêkanbûna jiyana di van şert û mercan de û ya di van sîstemên riziyayî de..

Emîneyê jî weke hevalên xwe yên li jor ji bajarekî mezin, ji ber xwendinên xwe yên feminîst ku tu rê ji çareserkirina kuştina jinan re nedîdît, berê xwe dabû êgir.

Berê xwe dabûn êgir; ew kesên di temenên biçûk de guherînên mezin çêkirin. Ji jiyanên bêhêvî berê xwe dabûn hêvî û azadiyê. Ji jiyanên bêhêz û bêîrade reviyabûn û xwe kiribûn hêz. Tunebûna xwe dikirin hebûn. Ji qad û bajarên neewle û lê dîlgirtî berê xwe dabûn çiyayên heybet. Carinan ji qefesên zêrîn û jiyanên bêtanq û top berê xwe dabûn cengên giran. Destên bi qelem û lênûskan, tix û dantêlan, hevîr û şîvan bûne destên bi keleş û guleyan; bûne destên guleyên hêviyê, guleyên ku bûne hêviya gelekî û rizgarbûna jinên cîhanê. Guleyên parastina rewa, tirs û xofa hovan û kelemên çavên dijminan...

Li ser civaknasiya gelê kurd bi piranî demên hilbijartinan xebat û lêkolîn tên kirin. Di van xebatan de jinên ku dikarin xwe îfade bikin, dikarin derheqê siyaseta kurdan û navdewletî biaxivin, hejmara jinên xwenda, jinên xwedî îrade û li mafên xwe derdikevin û xwe biparêzin jî wekî nexşeya encamên hilbijartinan in. Cihên ku tevgera azadiyê gihayî, hatine rêxistinkirin ji aliyên tundiya nav malê û kuştina jinan ve jî li gor cihên rêxistin nebûyî baştir in. Li wan deveran zilam nikarin zordestiyê li ser jinan bikin û ji aliyê hişmendiyê ve jî her çi qas em têr nebînin jî di astekê de ne. Rêxistinbûna tevgera azadiyê, asta azadbûn û mercên jinan bi hev re paralel in. Hêzê ji hev digirin. Dema ku yek jê qels dibe ya din jî kêm dibe.

Têkoşîna sih û heft salên tevgera azadiyê hêz da jinan. Rê û rêbaz dane wan û ji wan re bû sîwanek, alternatîfek. Di jiyana wan a bêçare de ji wan re bû çare û bo rêyeke sêyemîn. Ev kurteçîrokên ku li jor hatine behskirin pir in. Her çîrokek bi tena serê xwe dibe romanek. Sê pirtûk jî têrî vegotina emrê Sakîne Cansiz nekiriye. Ew navên hatine nivîsandin ne rast in lê çîrok rast in. Ev jiyanên van lehengan her yek ji aliyê jineolojî û civaknasiyê ve dibin mijarên tezên berfireh.

Belê berê xwe dabûn êgir gulîmor û kezîzerên xwediyên van çîrokan, weke teyrên ji her welatî ref bi ref ji sermayan ber bi germahiyê ve koç dikin. Berê xwe dane êgir, tifing û guleyên hêviyê. Pêşiyên me berevajî negotine 'zêr zane, zor zane, devê tifinga mor zane.'





Dilan Aydin

# Nameyek ji mirinê re...

*"Kengê li çavên te binêrim/ dilê min bi oqyanûsek tê şuştin/ bi ku ve diçim/ li nik te dimînim/ wekî mayîna stêrkan a li asîman."*

Ev helbesta ku werger e û nizanim a kê ye, çiqas li gorî te ye Gulê! Çavên te awêneyê giyanê te bûn... Dilê me bi oqyanûsek dişûştin ji nepakî û bêhêvitiyê. Çavên te; xwe bi deryaya zarokatiyê şuştibûn, pak û ronî mabûn. Hêvî, xeyal, hezkirin, rêhevaltî, hemû bi çavên te zindî dibûn, di vê tofana nebûna gelek tiştan de.

Beriya çend salan dema te xatir ji min xwest û tu çûyî; min ji bo te nivîsek bi sernavê "Nameyek ji veqetînê re" nivîsîbû di Rojnameya Azadiya Welat de. Sala wê baş nayê bîra min lê dibêjim qey 9-10 sal berê bû. Ji wê rojê ve rûyê te, dengê te, her dem li bîr û xeyalên min man. Têkiliyeke xwezayî ya bi hevdîtineke 'tesadufî' dest pê kiribû di navbera me de çêbûbû. Me gelek ji hev hez kiribû, em bi hev re li ser gelek mijaran axivîbûn lê nebes bû! Me ew demên ku li gorî niha baştir bûn, xwedî derfet bûn, têr û baş bi hev re derbas nekiribûn. Piştî çûyîna te, min ev yek fam kiribû, heyfa min li 'wan deman' dihat lê tewş bû êdî tu wekî çûkan firiyabûyî çûbûyî... Te bi gotina "Ez dixwazim bi lez bijîm, ciwan bimirim" armanca xwe diyar kiribû. Piştî du sê salan min dîmenek te dît, te û koma xwe bi hunermendekî re stran digot, kena li ser çav û lêvên te weka xwe bû, tu guleke geş, bi hêvî û biryar bûyî.

Niha dixwazim hemû gotinên bi hêvî û bêriyê, barkirî ji bo te bibêjim! Di ronahiya dil û çavên te yên ku nedişibiyan ên tu kesê de bibînim ku mirin; tiştekî pûç e! Jiyana me ya ku carna me dişibîne miriyan, ji te pir dûr bû. Tu bi jiyanê re, bi demê re di pêşbaziyek de bûyî. Wekî hebûneke mûcîzewî jiyayî, sekn û kesayetiya te, helwest û ramanên te tevî hemû bahoz û tofanên cîhanê jî xwe parastibûn. Kenê li çavên te wisa ji dil bû ku xwe berdida ser lêvên te jî. Min tu kesê nedît ku weka te, di her mercî de kena li ser çav û lêvên xwe biparêze!

Havîn e Gulê! Çûyîna te bi qasî germahiya tebaxê çav û dil dişewitîne! Beriya mehekê te gotibû min pir bêriya Mizgînê, we û welat kiriye. Min jî gotibû ku ez ji dil bawer dikim em ê hev bibînin. Lê... Ev çûyîna bê xatirxwestin ji ku derket! Te her dem digot "Ez baş im, hindik maye, ez ê vegerim."

Wisa bê xatirxwestin bi ku ve diçî Gulê! Çûyîna te; hêvî, hezkirin û kenê li ser rûyê me jî bi xwe re bir di van rojên havînê de! Çûyîna te bexçeyên gulan bê av hişt, xemeke bêpênase li temenê me zêde kir! Qurbana kenê çavên te bim Gulê! Hemû çek, şer û peyçûn bibin toza pêlavên we. Hemû gule û bombe bibin bi qurbana rûyê te yê zarok!

Nivîsîna ji bo 'çûyîna te ya ji cîhanê' her çiqas zor be jî ji bo xwe peywir dibînim. Dizanim tu yê bixwînî! Mirin ji bo me tevan e lê piştî ewqas êş û zehmetiyên ji bo başbûnê li welatên dûr; pir zor e! Ji bo me yên sax mayî, êşeke bê pênase ye, wijdanê me diêşîne.

Dizanim, piştî êşên 5 salan, tu niha li welatê xwe, li gundê xwe bi aram î. Bi gihîştina axa xwe kêfxweş î, birînên te yên kûr, baş bûne niha... Dizanim, tu stêrkeke li asimanê Kurdistanê yî, guleke li gulzarên pakrewanan î... Dizanim, ev jiyan xewnek e, nîvî ye, bêdad e lê mirin şiyariya jî vê xewnê bixwe ye. Lewre bi mirina hezkiriyên xwe re yên sax dimirin lê yên mirî jî nû ve vedijin!



Zehra Mohammedzadeh

# Raperîna ku qet venemirî

Dema ku em agahî û gotegotên heya roja me ya îro hatine di bêjingê re derbas dikin, em rastî gelek jinan ku di çaxên cuda de, nexasim di qadên wêjeyê de rolên girîng lîstine, tên. Wan di coş û xiroşa dîrokî de, di şer, koç û heyamên biyom de, li ser vê erdnîgariya bibereket dest avêtine pênivîsê û bi awayekî hosteyî rewşa dema tê de, li ser jiyan û evîndariyê nivîsîne. Bi taybetî jî ew hostatî, baldarî û wêrekiya wan a di nivîsîna helbestan de mirov dikare pir zelal di her rêzikek helbestên wan de bibîne.

Di qada wêjeyê de jinên wek Zîbolnîsa Zivar Girosî, Sahibe Dunbûlî û Heyran Xanima Dunbûlî xwedî kar û xebatek girîng bûne. Bi awayekî herî baş, zelal, rewnaq û ziz rêzik rêzkirine ji morîkên çavên xwe. Nemaze li ser hafizeya civakî ya vî gelî û di şikilgirtina çanda wî de bandorek wan a ber bi çav hebûye.

Helbet di vê hafizeya kevnar û serpêhatiya gelê kurd de, behsa nav û bîranîna hin jinan tê kirin ku di qadên cihêreng de, nexasim di qadên wêje û helbestnivîsiyê de, bi reng û dengê xwe beşdar bûne, lê mixabin derveyê navê wan, berhemên wan nehatine parastin.

Jinê bê ku guh bide zextên civakî yên dema tê de dijiya, bi reng, deng, hest û hestiyariya jin ê bi nêrandina wê teşe bi raperîna xwe daye, di diyarkirina wê de bi baldar nêz bûye. Raperînek ku ji serê çarînên hatine xêzkirin, wê deng bida û xwe bigihîne çemê bicoş, bi rastiya wê ya dîrokî re bigiha hev.

Ev ji ji berhemên ku li pey xwe hiştine û dengê raperîna wan a di vê qadê de ku bûye ruh, jîn û dengê enderûn ê têkoşîna wan diyar e. Ew dengê zelal ê jinê ji nifşekê ber bi nifşeke nû ve, bê rawest û aram herikiye. Carnan jî bi kerb û wek pêtek agir bû ku qet venemirî.

Dema ku em bûyerên dîrokî yên sedsalên beriya vê li rojhilatê Kurdistanê û rewşa wê ya civakî dinêrin, çi jiyana wan a kevneşopî, êl, eşîr û çi jî di jiyana koçerî de, jinên kurd her tim bi rêzdarî, bihêz, bibandor û kêrhatî bûne; her çend têkoşînek mezin li hemberî pergala nêr û kevneşopiyên wî ku li ser hebûna wê ferz dikir jî hebûbe, dane meşandin. Lê van xwe ferzkirinên pergala nêr û nêzikatiyên zilam ên paşvero nekariye bibe berbest li pêşiya hest û ramanên jinê.

Jixwe jinên ku di wan deman de bandora xwe ya li ser wêje û helbest nivîsiye dane hîskirin, bi awayekî hatine astengkirin. Yan berhemên wan nehatine tomarkirin; lê di çend mînakên ku em ê niha bidin de jî em ê bibînin ku ew jin ew çend bibandor bûne ku nekarîne nav û dengê wan bi awayekî giştî bitefînin; nekarîne li pêşiya hestên wan ku wek avek zelal diherikî bisekinin.

Ji ber vê, ger dem bi dem kevneşopî, irf û adetên civakî xwestibe pêşî li jinê bigire û ev yek derketibe pêş li hafizeya kolektîf a civakê jî, jinê kariye wek çîroskên rojê xwe li qulên xaniyan ku bi tarîtiyê hatibûn dorpêçkirin, bidin alî û biçiriskin.

Zibolnîsa Zivar Girosî jî yek ji wan jinan bû ku bi stranbêjî û helbestên xwe dihat nasîn. Helbestvana kurd Zibolnîsa, yek ji neviya Elî Şokr (Giros) bû û ew di nîvê sedsala dazdehan de jiyaye. Gelek helbest nivîsîne û xwendine ku pir kêm ji wan heya roja me ya îro hatine. Ev çend çarînên jêr jî ji wê ne:

*Serek ku tu demê xweşiya xwe a xemilandinê nedît*
*ji beden hat jêkirin*
*û çavekî ku tu caran xweşiya dîtina dîlbera xwe çênebûye*
*çi baştir ku kor be*
*di vî bajarî de şaşikên serdaran bûn xefleta milet û xapandina wan,*
*û vê rêkirina van bendikê zinarî…*
*di vê dinê de hîs û heskirin*
*û meyzekirina warê hevaltiyê bê qîmet bûye*
*Zibolnîsa pîr û kal bûye*
*kesek xwazyarê biha û qedrê wê nîne*
(Werger: Argeş Avesta)

Helbet Heyran jî yek ji wan jinên kurd e ku di helbestnivîsînê de rê li fikr û ramanên nû vekiriye. Heyran Xanima Dunbûlî keça hakimê Xoy û Urmiyê, Kerîm Xanê Dunbûlî ye. Di qirnê sêzdehan a hicrî de jiyaye. Helbet girîng e ku mirov bibêje ew yek ji jinên herî bibandor a dema xwe bûye. Di helbestnivîsiyê de xwedî meharetek cihê bûye. Dîwanek ji pênc hezar helbestên bi zimanê kurdî, tirkî û farisî li pey xwe dihêle. Heyran Xanim helbestvanek harîkulade bûye; ku mirov vê yekê di helbestên wê de jî pir baş dikare bibîne. Piraniya helbestên wê li ser wekîlê Qaçar Ebbas Mîrza, dayik û xwişkên wê ne.

Beşek ji helbesta Heyranê;

*Ji dûriya te bihara dilê min bûye payîz*
*ax ez û şev û rojê min gorî te*
*karê dilê min bûye axî, nalîn û girî*
*porên te, xalên li ser rûyên te*
*wekî telik û geniş ji bo nêçîrê ye*
*dema tu xwe naz dikî*
*dilê min ji xwe re dibî*
*tenê carekê te negote min tu nexweş î,*
*eşqa min î ka tu çi dikî*
*dil ji dûriya te evqas bilind û bihêz*
*qêrîn û figan dike*
*ku felek û esiman guhê xwe digiiiiiire*
*Heyran tu yekemîn kes nînî*
*Ku te dilê xwe spartiye wî*
*Gelek kes vekî te meşoqê wî ne*…(Werger: Argeş Avesta)

Sahibe Siltan jî ji malbata Dunbûlî ye. Ew hevjîna Ebûlfeth Xan Êbn Morteza Qolî Xanê duyem ê Dunbûlî ye û di nîvê sedsala 13'an de jiyaye. Wê ne tenê helbest dinivîsîn, di zanista astronomiyê de jî xwedî agahî bû û xebat dimeşandin. Ew di darêjnivîsî û gelek pîşesaziyan de jî pispor bû, di hunera xweşnivîsiyê de jî kêm nedima.

Ew ê jî wiha çarik rêz bikirana;

*Şahzade Hesen mêrxwas û pêşmergeyek netirs e*
*mirovek birûmet û xweş û şîrîn gotar e*
*ew wek dara Servê*
*di malbata şah Hesen mirovekî bi tedbîr û rastî bîne*
*û di xweşikbûna xwe de wekî gula yasmîn e*… (Werger: Argeş Avesta)

# Krîz berê wan dide kurdan!

Qedrî Esen

Li Tirkiyeyê, ji ber pêkanînên antî-demokratîk krîzeke kûr a aborî û siyasî heye. Dethilata AKP-MHP'ê hebûna van krîzan qebûl nake. Wekî ku li welat rewşeke bi vî rengî tunebe tevdigerin û daxuyaniyan didin lê pêkanînên ku di her warî de vê rewşê radixin ber çavan pir zelal holê ne. Mînakên herî şênber jî daketina nirxê pereyê tirk û avabûna partiyên siyasî yên nû ne.

Destpêkê AKP di nav xwe de dabeş bû. Serokwezîrê AKP'ê Ahmet Davûtoglû dawiya sala 2019'an ji ber partiya xwe veqetiya û bi navê Partiya Pêşerojê partiyeke nû ava kir. Piştî Davûtoglû di destpêka sala 2020'an de Alî Babacan ku bi salan wezîrtiya AKP'ê kir jî ji partiya xwe veqetiya û bi navê Partiya Demokrasî û Pêşveçûnê partiyeke nû ava kir.

**Davutoglû û Bahçelî**

Hem Davûtoglû hem jî Babacan di rojên dawîn de rexneyên tund li AKP'ê dikin û li dijî gelek polîtîkayên ku bi hev re afirandibûn dertên lê tişta balkêş her du lîder jî ji bo dengê kurdan dilîzîn û polîtîkayên ku li dijî kurdan tên meşandin rexne dikin. Li gorî partiyên heyî pir bi pêş de diçin û angaşt dikin ku muxatabê çareseriya pirsgrêka kurdî ne û qala perwerdeya bi kurdî dikin.

Herî dawî Davûtoglû hat Amedê û angaşt kir ku ew dixwaze pirsgirêka kurdî çareser bike û dê dawî li pêkanîna tayînkirina qeyûman a ser şaredariyên kurdan bîne. Ji ber van daxuyaniyên wî, serokê giştî yê partiya nijadperest MHP'ê Dewlet Bahçelî bi awayekî tund rexne li Davûtoglû kirin û got ku Davûtoglû bi devê PKK'ê axiviye û dijberiya xwe ya li dijî perwerdeya kurdî anî ziman.



Serokên partiyên muxalefeta Tirjiyeyê li ser hev ji bo kurdan peyam dan û angaşt kirin ku ew muxatabê çareserkirina pirsgirêka kurdî ne lê van daxuyaniyên ji samîmiyetê dûr jî Erdogan û Bahçelî aciz kirin û ew kirin PKK'î!

**Babacan û Erdogan**

Serokê Giştî yê Partiya Demokrasî û Pêşveçûnê Alî Babacan jî di ser aboriyê de AKP'ê kir hedefa xwe û got ku ji bo çareseriya krîza aborî siyasî divê AKP'ê ji desthilatê biçe. Ji ber van daxuyaniyên xwe Babacan ket hedefa serokkomarê Tirkiyeyê Erdogan ku di zexmkirina faşîzmê de bi israr e. Erdogan bi zimanekî kuşpene got Babacan nikare dersên aboriyê bide wan.

Ji ber van rexneyên tund ên li hemberî hev ku rê li ber nîqaşa têkçûna dethilata wan vedike, Erdogan û Bahçelî bang li Seroka Giştî yaÎYÎ Partiyê Meral Akşener kirin ku ji sefê muxalefetê veqete û tev li bloka wan a faşîst bibe. Akşener, bi şert bersiv da wan û berovajiyê banga wan bi Babacan re, hevdîtinek kir û bi qesta CHP'ê got ku ew kesên ku bi wan re derketine rê li nîvê rê nahêle.

**Mûharrem Înce**

Di vê pêvajoya ku muxalefeta Tirkiyeyê rojeva Tirkiyeyê diyar dike de dengê parçebûnekê mîna AKP'ê ji CHP'ê jî hat. Namzetê CHP'ê yê Serokkomariyê Mûharrem Înce nîşanên veqetandina xwe ya ji CHP'ê û avakirina tevgereke din da. Piştî ku gelek senaryo li ser vê helwesta wî hatin nivîsandin Mûharem Înce derket pêşberî kamereyan û gelek rexne li partiya xwe kir.

Înce piştrast kir ku ew tevgerek ava dike û di vê der barê de got ku ji ber ku ew sekna partiya xwe ya li dijî faşîzma AKP'ê bes nabîne dertê rê. Mûharrem Înce jî mîna Davûtoglû û Babacan ji bo kurdan peyam dan. Înce, tifaqa hilbijartinên herêmî bi bîr xist û got ku partiya wî CHP bi dengê kurdan şaredariyên bajarên mezin bi dest xistine lê tenezulê nekirine ku spasiyekê li kurdan bikin.

# Elewî li dijî projeya rantê bibertek in

Navenda Nûçeyan

Li bakurê Kurdistanê deverên dîrokî û pîroz di hedefa dewletê de ne. Ji hêla dewletê ve di bin navên cuda de mudaxaleyî van deveran tê kirin û tên talankirin. Navçeya Heskîfê ya Êlihê ku xwedî dîrokeke 12 hezar salan bû, bi vê polîtîkayê di bin ava Bendava Ilisûyê de hat hiştin. Dîsa navçeya dîrokî Sûra Amedê beşeke wê ya mezin hat hilweşandin û di bin navê nûkirinê de pêşkêşî kesên nêzî dewletê hat kirin.

Niha jî Çaviyên Çemê Mûnzûrê di bin navê turîzmê de di hedefa delwetê de ne. Çaviyên Mûnzûrê weke ku ji navê wan jî diyar e, çavkaniyên destpêka çemê Mûnzûrê ne. Çemê Mûnzûrê li Dersimê di nav geliyekî kûr û dirêj de diherike û ji aliyê elewiyan ve pîroz tê qebûlkirin. Li gel pîrozî û nerazîbûnên elewiyan jî dewletê heta niha li ser vî çemî bendavên enerjiyê çêkirine û nirxên baweriya elewetiyê binpê kirine.

**Her tişt bibe bipere**

Weke ku ev ne bes be, niha jî ji bo rantê dixwaze mudaxaleyî çaviyên çem bixwe bike. Ji bo mudaxaleyê walîtiya Dêrsimê, projeyeke sererastkirina çaviyan amade kiriye. Pîroziya elewiyan weke "qirêjî" hatiye qebûlkirin û ji bo vê jî armanca projeyê weke "tunekirina qirêjiya dîmenan" hatiye diyarkirin. Li gorî projeyê wê hinek pir, otoparq, ciyê kampan, pez serjêkirinê û seyranê bên çêkirin. Wê têketina çaviyan jî bibe bi pere.

Çaviyên Mûnzûrê li navçeya Pulur a Dersimê ne. Li herêma çaviyan 40 çavî hene û bi xweşikahiya ya xwezayî balê dikişînin. Çavî ji bo geşt û guzariya Dêrsimê jî gelekî girîng in. Di mehên havîn û payîzê de bi hezaran kes ji bo seyranê diçin çaviyan û rojên xweş li vir derbas dikin. Ji ber ku hemû tiştên heyî xwezayî ne ger û geşta li vir niha bêpere ye lê heke proje pêk were dê êdî kes bi hêsanî nikaribe bê van çaviyan.

**Cem gerandin**

Hemû sazî û rêxistinên elewiyan ên li bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê li dijî projeya ku tê xwestin li çaviyan bê çêkirin. Di nav hefteyê de bi dehan sazî û rêxistinên elewiyan li dijî projeyê daxuyanî dan. Sazî û rexistinan di daxuyaniyên xwe de destnîşan kir ku çavî ji bo wan ziyaret in û ne cihê rantê ne. Rêxistinan bang li desthilata AKP'ê kir ku destê xwe ji çaviyên wan vekişîne û ji baweriya elewiyan re rêz bigire.

Tevî van daxuyanî û nerazîbûnan jî kemçe û makîneyên kar ên giran bi maşîneyên zirxî re ketin herêma çaviyan û bi dest talanê kirin. Welatiyên elewî yên li herêma piştî vê yekê çûn çaviyan û li dijî projeyê cem gerandin. Welatiyan piştî cemê li dijî projeyê dia kirin û xwestin ku navenda wan a pîroz ji bo bazirganiyê neyê talankirin.



# Operasyonên leşkerî gundiyan tengezar dikin

Bi operasyonên derveyî sînor ku bi xeyalên osmaniya nû tên lidarxistin re, li bakurê Kurdistanê jî operasyon bê navber tên kirin. Di nav hefteyê de li bejahiyên bakurê Kurdistanê ji hêla artêşa tirk ve gelek operasyonên leşkerî hatin sazkirin. Ji bo liv û tevgera çend gerîlayên HPG'ê bi hezaran leşker û maşîneyên zirxî û balafir dikevin tevgerê.

Operasyona ku bi navê Yildirim ango bi Birûsk ku di meha hezîranê de li Botan, Serhedê û Dersimê hatibûn destpêkirin didomin. Di van operasyonan de di navbera leşker gerîlayan de şer û pevçûnên dijwar diqewimin. Li deverên ku leşkerên tirk li hemberî gerîla neçar dibin agir berî daristanan dinin.

**Operasyona li Mêrdînê**

Di çarçoveya van operasyonanên artêşa tirk de di serî de li Botanê Amed, Dêrsim, Mêrdînê leşkeran agir berî bi dehan deveran da. Deverên ku agir hatin derxistin leşkeran destûr neda ku welatî mudaxale bikin û agir vemirînin. Ji bilî daristanan li Kurdistanê goristanên şehîdên PKK'ê yên li bejahiyê jî hatin şewitandin.

Ji bilî van operasyon û talankirina ku demeke dirêj e didomin, li Mêrdîn û Bedlîsê 2 operasyonên leşkerî yên cuda hatin lidarxistin. Operasyona li Mêrdînê li gundê Şêbê yê navçeya Dêrikê û gundên derdora wê pêk hatin. Ji bo operasyonê walîtiya Mêrdînê qedexeya derketina derve îlan kir. Operasyon tenê li dijî çend gerîlayan pêk hat.

Ji bo operasyonê hejmareke zêde leşker, cerdevan û maşîneyên zirxî sewqî herêmê hatin kirin. Di kêliyên operasyonê de destûr nehat dayîn ku ne mirov ji malan derkevin û ne jî sewal ji axuran derkevin. Bi vê hovîtiya mezin gundiyên li herêma operasyonê bi hev re hatin derbaskirin û tede û zilmeke mezin li wan hat kirin.

**36 gund qedexe kirin**

Dîsa bi heman rengî operasyonek jî li Bedlîsê hat destpêkirin. Walîtiya Bedlîsê, destpêkê ji bo operasyonê li berfirehiya 36 gundan qedexeya derketina derve ragihand. Piştî ragihandina qedexeyê bi maşîneyên zirxî hejmarek leşker û cerdevan sewqî herêmê hatin kirin. Piştî sewqkirina operasyonê dest pê kir û şer û pevçûn qewimîn.

Qedexeyê bi operasyonê re bi rojan berdewam kir û ji ber vê yekê gundiyên li herêma operasyonê gelek zehmetî kişandin. Di van mehên havînê de ji ber qedexe û operasyonê nikaribûn sewalê xwe bibin mêrgan. Gundî, neçar man ku giha û kaya ku ji bo mehên zivistanê depokirine, bidine sewalên xwe. Gelê herêmê ji ber operasyonan bibertek in.

*AMED*

## EZ KARÊ XWE BI HEZKIRINA ZIMAN Û WELATÊ XWE DIKIM

# *Di navbera hunermendî û dînîtiyê de*

→ Rizoyê Xerzî

Lê yek ji sedemên herî girîng, ew herêm dest ji çi berde, ew dev ji zimanê xwe bernade ango dev ji çanda xwe bernade. Herêmeke ku zimanê xwe bi kar neyne wê çawa bikaribe wêjeyeke baş bike; wê çawa zimanekî argoya wî xurt, her tiştê wî xurt peyda bike. Nivîskariya vê herêmê bi zimên bi pêş ketiye.

### Fewzî Bîlge kî ye?



Fewzî Bîlge di sala 1962'an de li Dêrika Mêrdînê hatiye dinyayê. Malbatê bi çêbûna wî re koçî Qoserê kiriye û wî heya lîseyê qedandiye li vir jiyaye. Piştî wê malbata wî koçî Stenbolê kiriye û wî li wir bêtir guh daye hunera şêwekariyê. Berê li Stenbolê gelek pêşangeh li dar xistine; piştre li bajarên Edene, Antalya, Îzmîr, Amed, Mêrdîn, Batmanê û piştre jî li Almanyayê li bajarê Selê. Ji aliyekî din ve Bîlge di warê nivîskariyê de jî gelek çalak xebitiye û heta niha 9 pirtûkên helbest, çîrok û roman nivîsandine.

*Nivîskar û şêwekar Fewzî Bîlge heta niha 6 pîrtûkên çîrokan, 2 pirtûkên helbestan û romanek nivîsandine û çap kirine. Li kêleka nivîskariya xwe, di warê xêzkariyê de jî bi tabloyên xwe yên bedew derdikeve ser dika şêwekariyê. Me xwest der barê kar û xebatên wî de vê hevpeyvînê bikin.*

***Fewzî Bîlge bêtir xwe li ku dibîne û di kîjan hembêzê de xwe rihetir hîs dike; di hembêza çîrok, roman, helbest an jî di cîhana rengan a şêwekariyê de? Tu dikarî ji kerema xwe hinekî behsa vê azmûna xwe ya di nav vê cîhana rengîn de bikî?***

Bawer nakim dilbijokî be. Bêtir ji hezkirinê ye tu dibêjî qey ez xwe di hembêza hemûyan de dibînim lê ya ji bo min ku ez qet nikarim dev jê berdim, ya jêneger wênesazî ye. Min morîka şîn daye gişan lê dibê qey ez herî pir ji wê hez dikim. Ne xem e ew ji bo min kêfxweşî û pêşketinek e.

***Ez texmîn dikim ku tu gelek caran sûdê ji vê yekê werdigirî û carnan mijara helbesteke xwe dikî tabloyekê an jî gelo berevajî jî dibe; yanî bi gotineke din mirov dikare bêje bi piranî li ba Fewzî Bîlge pêşî helbest dibe tablo an tablo dibe helbest?***

Wekî tê zanîn hemû beşên hunerê hem hevdu hem hunermendan xurt dikin. Hemû beşên hunerê bedew in û gava hemû bedewî li cihekî bicivin, ew cî an jî kes te bivê nevê bedewtir dike. Nizanim çiqas rast e lê ez wiha dinirxînim.

Ji loma, carnan wêneyekî min vediguheze helbestekê, an jî carnan çîrokek vediguheze wêneyekî. Encam çi be ez bi wê rewşê qayil im.

***Ez bala xwe didim te piranî tu di qorziyeke xalî û bêdeng de karê xwe dikî. Hema bêje ji gava me hev naskiriye her tim torfelaqî em li hev rast hatine?***

Rast e hevalê hêja. Gelek kes dibêjin tu mirovekî veşartî yî. Dibêjin ne ji berhemên te be haya kesekî ji te çênabe û em ê qet ji te haydar nebin. Ma ya girîng jî ne ew e ku mirov bikaribe berheman biafirîne; ma dengê defê ji dûr ve ne xweştir e! Ez di mijara zemên de pir çikûs im; dibêjim qey loma zemanê xwe bêtir li xwe xerç dikim, ji xwe re hiltînim. Ez ji çikûsan hez nakim lê çikûsiyên wiha jî diparêzim. Dizanim ger ez xwe bi tenê nehêlim nikarim li ser berhemên xwe bixebitim. Di ciwaniya xwe de min piraniya zemanê xwe dida mirovan û anha êdî ewqas zemanê min nemaye. Jixwe min têra xwe li wan belav kir, ew bese. Ji bo ku ez bigihêm xeyalên xwe mecbûr im jiyaneke wiha bipejrînim. Xeyalên min pir in û hîn negihiştime gelekan.

Dibêjim qey tu jî mirovekî pir mijûl î û ji bo min jî girîng e. Salê mehê carekê be jî em torfelaqî li hev rast tên lê di wê baweriyê de me ku em hinekî hev dişopînin û ji hevdu haydar in.

***Wekî tê bîra min li Êlihê hin şagirtên te yên şêwekariyê hebûn. Ew xebat giha çi astê û haya te ji wan şagirtên te heye, tu dikarî hinekî behsa wê xebatê bikî?***

Di sala 2000'an de li Êlihê kargeha min a hunera şêwekariyê hebû. Piştî çend salan me dest bi xebatên wêjeyî jî kir. Min her du beş bi hev re meşandin. Ew kargeh nêzî 15 salan xebatên xwe domandin. Di vê kargehê de gelek wênesaz û wêjevan gihan. Hinek ji wan jî niha bi nav û deng bûne. Li gorî min girîngiya vê kargehê ew bû ku cara yekem li bajarekî kurdan 15 salan bi zimanê kurdî perwerdeya wêje û wêneyî hat dayîn. Ew kargeh bandorek mezin li wî bajarî û heta li bajarên me yên din jî kir.

Wekî mînak; gelek komên xwendinê, maseyên wêje û hunerê çêbûn û hinek hîn jî xebatên xwe didomînin.

Ez gelek kêfxweş im ku min 15 salên xwe da wî bajarî û kir ku gelek hunermendên ciwan derên holê.


Di vê kargehê de zimanê hunerê û şêwekarî bi pêş ket û ew jî li gor min pir girîng e.

Piştî 15 salan xebatên wê bi dawî bûn. Ew pêvajoyeke girîng e bo huner û şêwekariya kurdan.

***Mesela Dêrika çiyayê Mazî çi ye? Navçeyeke ewqas biçûk bi qasî bajarekî mezin nivîskarên wê hene. Çima ew jî wek Amûda Binxetê hem bi dînên xwe, hem bi çêrên xwe û hem bi hejmara zêde ya nivîskarên xwe bi nav û deng e?***

Dêrika çiyayê Mazî bajarekî pir kevnar e û xwedî çand û dîrokeke pir xurt e. Dibêjim qey sedem jê ev e ku hunermendên baş û kesayetên girîng lê digihên. Bi awayekî din jî dînên wî jî wekî te gotî bi qasî yên Amûda Binxetê pir in. Ez dibêm di navbera dînîtî û hunermendiyê de nuanseke biçûk heye. Yên ku dîn nebûne hunermend mane, yanî bûne hunermend. Dînîtî û hunermendî du tiştên pir nêzî hevdu ne. Weke ku te got; li Dêrikê û mirov bibêje li herêma Mêrdînê rastir e. Gelek hunermendên baş lê gihane û sedemên wê yekê pir in lê yek ji sedemên herî girîng, ew herêm dest ji çi berde ew dev ji zimanê xwe bernade ango dev ji çanda xwe bernade. Nivîskarî yekser bi ziman ve girêdayî ye. Herêmeke ku zimanê xwe bi kar neyne wê çawa bikaribe wêjeyeke baş bike.

Wê çawa zimanekî argoya wî xurt, her tiştê wî xurt peyda bike. Nivîskariya vê herêmê bi zimên bi pêş ketiye.



Gava zimanek bi pêş bikeve jixweber fikir û raman û hemû teyisînên aqil bi pêş dikevin.

***Tu rewşa şêwekariyê ya li Bakur çawa dibînî û bi giştî di nav kurdan de?***

Rewşa şêwekariya kurdan roj bi roj pêşdetir diçe. Li gorî min di asteke baş de ye.

Bi taybetî van demên dawî ez navê gelek wênesazên ciwan û jêhatî dibihîzim. Wêne û wênesazî ji ber gelek sedemên dîrokî, civakî û olî hetanî salên 90'î pir hejar bûn lê niha rewş ne xirab e. Ciwanên nû hêviyê didin me ku siberoj wê pir baştir bibe.

Heke rewşa siyasî yanî pirsgirêkên siyasî çareser bibin, wê huner û hunermend bêtir zemînê bibînin ku pêşdetir biçin.

Wêne û wênesazî her diçe xwe li ser vê xakê dide hezkirin. Hezkiriyên wêneya pir in lê weke ku min got; divê pirsgirêkên siyasî bên çareserkirin. Wê demê wê bê dîtin ku kurd çiqasî ji wêneyan ji peykeran hez dikin.

***Wekî em dizanin têkildarî û elaqeya xelkê me zêde bi vê hunerê re tune. Tu ewqas tabloyan çêdikî û ez dizanim ku alav û boyaxên xêzkirinê jî gelekî buha ne, gelo hatineke ku têra lêçûnên te bike heye an jî tu çawa dikarî berdewam bikî û lêçûnên xwe çawa peyda dikî?***

Mijara ku ez qet naxwazim qala wê bikim mesela pera ye. Bela ku pir ji wêne û wênesaziyê hez dikim ez tiştên wiha qet nafikirim. Hezkirin girîng e. Ma gava şervanek şer dike dibêje gelo hûn ê çiqas pere bidin min. Na, ji bo wî şervanî ya herî girîng hezkirin e, hezkirina welatê wî ye û dikare ji bo tiştê jê hez dike bimire jî.

Ez jî ji welat û zimanê xwe hez dikim û bi kêf bi vî karê xwe re mijûl dibim. Ew kêfxweşî besî min e. Wekî din jî dikarim bêjim ku tenê li bajarê Amedê 5 hezar xaniyên min hene bi gotineke din her tabloyek xwe bi xaniyekî nadim. Lewre ez gelekî dewlemend im.

***Çi xebatên te yên nû hene; çi di warê nivîsê de çi di warê şêwekariyê de?***

Wekî ku tu jî dizanî di van demên dawiyê de, min bêtir kesayetên ku ji wan hez dikim, kesayetên girîng wekî portre xêz dikim û parve dikim.

Romaneke min a bi navê Qijalk wê di demeke nêz de li weşanxaneya Lîsê çap bibe. Çend roman, çîrok û helbestên min ên amade hene ew jî li hêviya çapê ne. Wekî din jî ez niha li ser ferhenga biwêjên hunerê dixebitim û bawer im ew jî dê di demeke nêz de amade be.







# Siwarên hespên heqîqetê

Kadîr Stêra

Cenga siwarên hespên heqîqetê ye. Ber bi xwebûnê ve dimeşin; rê li ber tarîtiyê digirin; deriyan li ber ronahîyê vedikin. Ew Zerdeştên hemdemî bixwe ne, li Zagrosan li heqîqetê digerin. Pepûleyên ji agir in bi çirûskên xwe dilê Manî geş dikin. Hebûna xwe di destaran de dikutin, rastîya gelê xwe li ser tevnekê dihûnin. Sebra xwe di teştên hêvîrên Îştaran de distrên. Ji çemên Şahrûd îksîrê vedixwin û bê mirin dibin.

Teyrên Tawis in, bi dengên wan desthilatdarî têk diçe. Stargeha wan çol in, newal in, şikeft in... Di buharan de guldexwîn in, di zivistanan de berfîn. Bi bêhna xwe geş dikin deşt û zozanan, xweza bi rengê wan dixemile. Moriyên kedkar in, di şiverêyan de şopa lingê wan dibe rêça li xwe gerînê. Ji xwe bawer in, ji ber vê ye tirs û xofa Nemrûd û Ehrîmanan.

Derwêş û Edûlê ne, di stranên dengbêjan de li ser wan tê lorandin. Ceng e, siwarên cilşîn li qadê, agirgehên li Laleşê bi hêza xwe xurt dikin. Kezîyên keçên Keyasker bi dilê xwe dipêçin; tî, birçî, bêxew in... Bi salan e li hember hûtên heftserî şûr in.

Mirov, gava li ser wan binivîse lênûsk têrê nakin. Na na! Ez pirole nakim. Tiştên ji dilê min tên dinivîsim. Wekî vê strana niha ez lê guhdarî dikim; strana gotinên wê yên Şêro Hindê ne: "Ji vê refê neqetiyan tev li wê fîriyan.'' Ew jî difirin wek sîmiran. Berê xwe didin zarokatiya xwe û wenda dibin.

Di şevbihêrkek zemanê berê de, li derve baran, ceyran tune. Şewqa agirê sobeyê dide arîkê odeyê; lempeya bi bizmarê dîwêr ve daliqandî vêketî, bêhna mazotê jê difûre. Qirçeqirça êzingên di sobeyê de û dayikek porspî ji zarokên gundiyan re qala wan dike û dibêje: "Min hundir rêş dikir, çawa min merşa li odeyê raxistî rakir, defterek qalind kete ber çavê min. Hetanî nîvê şevê defterên Teleban dixwendin. Pir keç û xortên vî welatî bûn rêwîyên vê rêyê lawo." Zarokên gundiyan bi çîrokên wan mezin dibûn, hê jî bi hezkirina wan mezin dibin.

Gava li wê dayika çîrokbêj difikirim, hişê min diçe ser lehenga romanekê. Ew romana ku li dinê bi nav û deng bûye; pirtûka "DÊ" ya Maksîm Gorkî. Her hevokek wê rastiya dê û zarokan li ser çavê me dixe: "Dilê wan bi dayikan naşewite. Negirîn dayê, negirîn, bila dilê we xemgîn nebe." Lê çi fêde dayikên wan xemgîn dikin û dilê wan diêşînin. Meytên zaroyên wan bi rêya postayê ji wan re dişînin. Gotin lal dibin. Piçek hêsir jî ji çavên dayikê nayê xwarê. Serê wê ji ber kurê wê bilind e. Kurê wê bûye siwarê heqîqetê.

Em şaş dimînin. Dibêjin: "Çawa mirov vî tiştî bi mirovan dikin." Lê em tiştekî ji bîr dikin. Em dibêjin qey hema hinekî jî be di dilê wan de rehim heye lê çi rehim û çi hal. Ew hebûna xwe di tunebûna me de dibînin. Ji bo desthilatdariya xwe heger ji wan bê yekî ji me jî sax nahêlin lê yên bi dilê Enkîdû tevdigerin çi dikin? Bi ser halê xwe de, rêzê ji siwarên hespên heqîqetê re nagirin. Çi ferqa van kesan û desthilatdaran ji hevdu heye? Bi derba desthilatdaran em carekê tên kuştin; lê bi derba kesên bi qewmê xwe re dijminatiyê dikin re sed carî tên kuştin. Qey nizanin dawîya dawîn wê ev çîroka heqîqetê bi ser bikeve û lehengên wê govenda xwebûnê bigerînin. Heger, ew nizanin bila guhê xwe bidin dengê çiyayên asê. Bila binêrin bê lawên bavan, keçên dayikên xwe çawa govenda rûmetê digerînin.

Bila ew guhdar bikin em jî biçin wê odeya sobe lê vêketî û li wê dayika porspî guhdarî bikin: "Wê rojek were, ew siwarên hespên heqîqetê mizgînîya aştiyê, wekheviyê bidin me. Wê êdî Derwêş bi Edûla xwe şa bibe. Beko Ewan wê ji destana Mem û Zînê serê xwe bilind bike û li şabûna wan binêre. Wê xweliyê li serê bike. Wê bibêje : "Başî hebû min çima çû nebaşî kir? Min Mem û Zînê ji hevdu qut kir. Binêre, çawa Derwêş û Edûlê li qada cengê bi azadiyê şa dibin."

Zarokên gundiyan bi çîrokên dayika porspî mezin dibin. Di zarokatiya xwe de bîra dinyayê dibin û zû mezin dibin. Berê xwe didin xwebûnê û destanan dinivîsin.



# Tenêtî



Mizgîn Rewî

Li bin ezmanê şîn bombe dibariyan bi ser laşên biçûk de. Hêviyên wan têk diçûn. Xwelî diket nav çavên wî yên biçûk. Li derdora xwe dinihêrî da ku yekî nas bibîne lê na tu kesên nas nedidît di stargehê de.Tenêtî di vî temenê biçûk de bûbû parawî tik û tenê çavên xwe digirt. Dixwest tiştên xweş bifikire lê nedibû dengê girîna zarokan hawar hawara jinan nedişiht bifikire. Dema bêdengî çêbû, derketin derve. Dîmenên li derve qet jî xweş nînbûn, kesên negihîştine stargehê li kolanan xwe veşartine, birîndar bûne hin ji wan canê xwe ji dest dane. Di nav miriyan de li rûyek nas digeriyan çavên wî yên biçûk. Dilê wî diesirî, laşên perçebûyî ew dikir nav fikaran, gelo dibû ku bav an jî dayika wî be. Dema li kolanê dinihêrî, matmayî dima, ev xaniyên xerabûne kîjan ji wan mala wan bû? Nizanibû. Dikir nedikir ji hev dernedixist. Çavên wî bi cilek ketibûn, dema reviyabûn. Cara dawî vî cilî dîtibû. Çû li ber sekinî bi destên xwe yên biçûk xweliya li ser çavên wê paqij kir û lê nihêrî. Wekî ku di xewek şêrîn de be, xuya dibû. Ew hejikand, deng lêkir, 'dayê dayê ka rabe serxwe em herin dayê, dayê...'

Dengê balafiran dihat û ji dûr ve hawarek bi xelkê ket, 'rabin herin sitargehan, şer derketiye.' Bavê wî wekî ku tevizîbe li ber televizyonê sekinîbû. Dayika wî jî bi destê xwişk û birayên wî girtibû, li ber derî li benda wan bû. Çû destê xwe da ser milê bavê xwe got, 'bavo ka rabe em herin dengê balafiran tê' lê bavê wî wekî ku qutufîbe bê liv û tevger di cihê xwe de cemidî bû. Dayika wî gazî kirê jê re got hûn herin sitargehê, em ê jî werin. Wî got dayê ez nizanim sitargeh li ku derê ye. Dayika wî jê re got mirov bi kîjan alî ve çûn, hûn jî bi wê derê ve herin. Derketin derve. Herkes bi aliyê jor ve baz dida. Wan jî dest bi bazdanê kir. Kes li benda kesê nedisekinî; wey li wî ku xwe xelas bike. Car caran li pey xwe dinihêrî lê dayika xwe û bavê xwe nedidît. Cardin li pey xwe nihêrî. Dayika wî jê re dest dikir, ber pê ve bazda lê ew paşde zivirî. Li xwişk û birayên xwe gerand çavên xwe lê wan nedî dîsa dest bi bazdanê kir. Dengê balafiran nêztir dihat. Ket hundirê stargehê. Bi ketina wî ya hundir re dengê teqînekê hat. Derê stargehê girtin. Gumîna bombeyan dihat. Çavên wî li xwişk û birayên wî digeriyan lê ew nedîtin.

Tenêtî çiqas tiştekî pîs bû. Li derdora xwe dinihêrî lê kesên çav li wan digerand nedîtin. Fêm kir ku êdî bi tena serê xwe ye lê meraq dikir ka çi bi serê wan ve hatiye; li ku derê ne, sax an mirî ne. Dema çav bi xwişka xwe ket, got qey xewnek dibîne. Ber pê ve bazda. Destê xwe avêt destê wê, kaş kir. Ew jî fetilî bi awirên vala li birayê xwe nihêrî. Çavên wê li derdorê digeriyan. Wê jî laşê bavê xwe ê bêgiyan dîtibû keribîbû, nezanîbû ka çi bike. Bi destê eta xwe girt û dest bi meşê kirin.



Sîdar Jîr

## Şerê Tarîtî û Ronahîyê; EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ!

Gelek caran berhemên hunerî/edebî dibin zar û ziman û bîra welat û neteweyan. Hinekî din zorê bidin "xwe" rasterast dikarin bi reheti bibin nasnameyek xurt jî… Ev taybetîya huner û wêjeyê, di kûrahîya zemên de ji mirov re dibe per û bask û ber bi "ronahî"yê ve dibe.

Romana Yildiz Çakar a bi navê "EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ" jî êşa birîna me ya bi sedsalan e, tenê qalik girtîye lê qet baş nebûyê bi wêrekî bi me dide hesîn. Wekî gelek nivîskaran Yildiz Çakar jî bi ferhenegeke xas a jinane romana xwe honandiye. Bi ferhenga jinane re, xwîner neçar dihêle ku li tevzîyên êşa jinan ho vedin û bi taybetî jî ev rê me dibe ser mêlava jinên Kurd ên Êzidî… Ew jinên ku heftê û sê ber ji ber wan çûyî. Bi her berekî re, çerxa felekê me ber bi qîrîneke bêxwedî ve dibe.

Lehenga sereke ya romanê Şemsîxanê; *"Şemsa felekê ya melekê hê jî em nizanin lê hûrî û perîya bi xwe ruhê li Şengalê ye ew."* Şemsîxanê di dengê xwe de difetise… Bi xwe re xwîner jî difetisîne. Yildizê digel hemû êş û azarên jinên Kurd (Jinên Kurd ên Êzidî) jî jinan wekî çirûskeke jiyanê derdixe pêş; "*Çi cara amojnê destê xwe davêt tiştekî xwişînî jê dihat. Min hîç nedizanî, ava di robaran de ew qas awazxweş e, gava di stûyê jinê de bin." (rp.97)* Yildiz Çakar rêya ku diçe welatê Eldorado* di Şengalê re derbas dike û welatê Eldoradoyê jî li deşta Mûsilê şên dike. Ji bilî Şemsîxanê yên ku wî welatî av didin jî Dêya Xasê, Dêya Mêyan, Samîra û Keleşo yê ku bi ronahîya bêhna jinên Êzidî mezin bûye…

Di wêjeya/edebîyata cîhanê de, berhemên wêjeyî li hemberî sêdaran tim bûne wekî sîdaran û qewm ji neheqîyê parastine, di nîrê qirkirinê de gihandine nifşên piştî xwe… berhema Yildiz Çakar EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ jî her çiqas ji aliyê teknîkî ve hin tiştên/têgihên mîna li ser hûr nebûbin hebin jî dikare me û fermana destpêka qirnê bîst û yekan bigihîne qirnekî din. Lewma jî xwîner bixwaze nexwaze ev roman û romanên wisa bêhemdê wan xwîneran dikin siwarên *"Hetdban**"* ê û xwe didin ref û rex Şerfedîn… Ev hest dike ku xwînerên ku hay ji dîroka welatê xwe hebin bikevin pey derbên sur-real ên dîrokî. Yildiz Çakar her çiqas bi du "vebêjar"an roman 'sêwirandibe' jî bala xwîner ango xwendevan tim li nigê şikandî yê *Hedban* e(!)

Yildiz Çakar bi vê romanê, di ser şêr, teyr, mar û hwd gelek metaforan re, çanda resen a Kurdan li ber çêv radixe. Xurtbûn, xwedîtî, aîdîyet, tirs, hovîtî, azadî û aramî tevlihev e…

Ji metaforn wêdetir û ji bilî civaka Kurdan û bi taybetî jî Kurdên Êzidî hemû mirovahîyê di destpêka qirnê bîst û yekan de şerê rastîn ê "Ronahî" û "Tarîtîyê" dît. Yildiz Çakar beşeke biçûk a welatê xwe bi vê şêweyê "daye vegotin".

Jinên xas dikarin welatekî biafirînin. Mêrên xas dikarin welatê ku jinên xas afirandiye biparêzin gelo? Ev jî pirseke sereke ye di romana Yildiz Çakarê de(!)

Romaneke ku bi ferhengeke jinane daye ser şopa simên hespa Derwêşê Evdî û xwe digihîne roja me. Ji romanê jî em têdigihijin ku piştî heftê û sê fermanan ji bo ya heftê û çaran û bi heft şervanên "mîtolojîk" di ristên Cizîrî de jî nayê dîtin olan didin, li ser rêka ku ji bihuştê ber bi bihuşta vê jiyanê ve, ber bi Şengalê ve hespên xwe dibezînin. Çûyîn û hatin, mirin û jiyan, têkçûn û serkeftin/azadî, tarîtî û ronahî di nava rûpelên pirtûkekê de olan didin û Yildiz Çakar haya dinyayeke bêdeng bi dengê "mê" pê dixe; Ev rê naçe bihuştê!

***Eldorado: welatê xeyalî***

***** Hedban: Hespa Derwêşê Evdî***

**** EV RÊ NAÇE BIHUŞTÊ, Yildiz Çakar, Roman, Weşanên Lîs, 2019***

# Ji hikûmeta Iraqê nerazîbûnên şermoke

**Piştî ku fermandar û leşkerên artêşa Iraqê ji alî artêşa tirk ve hatin kuştin, nîqaşên der barê destwerdana axa Iraqê de zêde bûn, gelek nerazîbûn derketin lê ew di asteke pir kêm de man**

Li dijî destwerdana artêşa tirk a li ser axa başûrê Kurdistan û Iraqê û kuştina fermandarekî wan ê berdevkê artêşa Iraqê Yehya Resûl, bal kişand ser êrîşa dewleta tirk a li dijî fermandar û leşkerên Iraqê û got; "Divê Tirkiye bûyerê zelal bike û ji bo parastina sînorên Iraq û Tirkiyeyê, sucdaran ceza bike."

Berdevkê fermandariya operasyonên hevbeş ê Iraqê Tehsîn Xefacî jî li ser heman mijarê axivî û got; "Em bi Herêma Kurdistanê re der barê erîşê de di nav guftûgoyan de ne. Hinek wirdekarî hene. Sedema erîşê û fermandarê leşkerî di nav sînorê Iraqê de çawa hatiye hedefgirtin, tê lêkolîn kirin."

Li aliyê din, parlamenterê Iraqê Mensur Beicî diyar kir ku bertekên welatê wî yên li dijî destdirêjiyên dewleta tirk şermezarî ye û xwest baylozê Tirkiyeyê ji Iraqê were derxistin û hemû peywendiyên bi Tirkiyeyê re werin birîn.

Li gorî nûçeya malpera Sumeriyeyê parlamenterê Iraqê Mensur Beicî daxwaz kiriye ku Iraq bêdengiya xwe bişikîne û xwe ji bersivdayînên şermezarî yên beramberî destdirêjiya dewleta tirk dûr bigire.

Mensur Beicî got; "Divê dewleta Iraqê balyozê Tirkiyeyê derbixe û hemû peywendiyên xwe yên bazirganî û aborî yên bi Tirkiyeyê re qut bike. Bi vê yekê bersivek tund bide êrîşên dewleta tirk ên li ser axa xwe da ku dewleta tirk bi êrîş û binpêkirinên xwe ji ser axa me biçe. Heta ku Iraq li dijî Tirkiyeyê nebe xwedî bersivek guncav, dest ji van bersiv û daxuyaniyên nerazîbûnê yên şermezarane bernede, wê ne tenê ev binpêkirin neyên rawestandin, wê zêdetir bibin."

Her wiha piştî kuştina 2 fermandarên Iraqê ji hêla artêşa tirk ve, gelek nerazîbûn ji welatên ereban hatin lê çi ew nerazîbûn bin çi jî nerazîbûnên hikûmeta Iraqê hê jî di asteke şermoke de de.

Her wiha Wezareta Karê Derve ya Iraqê bi daxuyaniyeke nivîskî ragihand ku Wezîrê Karê Derve yê Iraqê Fuat Hisên bi rêya telefonê bi Wezîrê Derve yê Bahreyn Ebdullatîf Zeyanî û Wezîrê Derve yê Îmaratê Şêx Ebdula Bîn Zayid re axiviye.

Di daxuyaniyê de hate gotin ku Fuat Hisên ji wezîrên Bahreyn û Îmaratê xwestiye li dijî êrîşên dewleta tirk ên li ser axa Iraqê piştevaniya asayîş û serweriya Iraqê bikin.

Li gorî heman çavkaniyan wezîrên Bahreyn û Îmaratê diyarkirin ku welatên wan piştevaniya asayîş û serweriya Iraqê dikin. Her wiha anîne ziman ku divê dewleta tirk demek zûtir êrîşên xwe yên li ser axa Iraqê bide rawestandin.

Behaneyên wan çi bin bila bibin çawa leşkerên welatekî din derbasî nav axa Iraqê dibin û di ser de jî fermandarên wî welatî li ser axa wî welatî dikujin! Loma jî nerazîbûnên tên kirin tenê di asta şermezarkirinan de mane û tu qîmet û nirxê wan nerazîbûnan tune ye. *BEXDA*



# Michael Rubin: Divê Ewropa û Amerîka bêdeng nebin

Navenda Nûçeyan

Li gorî raporeke nû ya lêgervanê ya giştî ya Wezareta Parastinê ya Amerîkayê (Pentegon) ya beriya çend rojan, Tirkiye hîn jî navendeke herêmî ya derbasbûna çeteyên DAIŞ`ê ye.

Li gorî heman raporê, fermandariya Ewropa-Amerîkayê, Tirkiyeyê wekî "navenda sereke ya hêsankirina derbasbûna DAIŞ`ê" bi nav kir û wiha got: "Tevî keda hevbeş a Sûriye-Iraqê li ser erdê jî, hîn pirsgirêka ewlehiya sînorên başûrê Tirkiyeyê yên bi her du welatan re heye."



Di demên dawîn de rexne û tawanbariyên dewletên rojavayî ji bo dewleta tirk ên der barê piştgiriya komên terorîst li Sûriyeyê de, zêde bûn.

**Li dijî Ewropayê şantaj dike**

Girêdayî mijarê, berpirsê berê yê Pentagonê Michael Rubin ji ANHA`yê re got: "Bi rastî, ez ji wê yekê zêde hêvî nakim. Ji ber ku Ewropa li hemberî gefên Erdogan ku her tim koçberan wekî kaxizekî şantajê bi kar tîne, lawaz e." Rubin wiha lê zêde kir: "Erdogan her demê nîşan dide ku dikare Trump kontrol bike."

Rubin diyar kir ku tekane rêbaz ji bo hesabxwestina ji Tirkiyeyê ew e ku Ewropa darbeyekê li Tirkiyê bide û wiha got: "Ji bo darbe bihêztir be, divê Yekitiya Ewropayê (YE) yekser ketina balafirên Tirkiyeyê ji balafirgehên xwe re qedexe bike û hemû rêwîtiyên asîmanî yên ber bi peravên deryaya Egeyê û deryaya Spî ve, rawestîne."

**Nakokiya li Pentagonê**

Rubin di dewama nirxandina xwe de ev tişt aşkera kir: "Li gorî raporê, Wezareta Derve ya Amerîkayê Tirkiyê wekî hevalbendekî dibîne ku Pentagon li ser wê yekê bi Amerîkayê re li hev nake."

Rubin wiha domand: "Wezareta Derve ya Amerîkayê siyaseta derve ya dawî ya Amerîkayê temsîl nake. Heke Wezareta derve û Pentagon li hev nekin wê demê dê koşka Spî wekî dadmend destwerdanê bike."

**"Divê kurd zextê bikin"**

Girêdayî stresa di navbera Amerîka-Tirkiyeyê de û ferzkirina cezayan li dijî Tirkiyeyê, Rubin wiha got: "Ez bawer im ku Washington dê cezayan li Enqereyê bibire. Lê belê dê wê yekê wekî refleksekê li dijî têkiliya Tirkiyeyê bi Rûsyayê re bike ne ji bo tiştekî din. Lewra ji bo cezakirina Tirkiyeyê, divê kurd zextê bikin."

## Îsraîl û Îmarata erebî peymanekê îmze dikin



Navenda Nûçeyan

Serokê Amerîkayê Donald Trump da xuyakirin ku di demeke nêz de dê li Amerîkayê peymanek di navbera Îsraîl û Îmarata erebî de were îmzekirin. Peyman dê ji alî serokwezîrê Îsraîlê Binyamîn Netenyahû û Şêx Mihemed Bin Zayid Bin Niheyan ve were îmzekirin.

Her wiha Trump pesnê vê peymanê da û wiha got: "Ev peymaneke dîrokî ye û ez ji her du aliyan re ji bo wêrekiya wan spas dikim." Bi bihîstina vê nûçeya peymanê re gelek welatên helwesta xwe ji vê peymanê re aşkera kirin. Behrênê jî kêfxweşiya xwe ji peymanê re anî ziman û got ku ew dê bibe sedema rawestandina Îsraîlê ya bi xwe ve girêdana erdên Filistînê. Her wiha da xuyakirin ku ew dê bibe wekî firsendekê ji bo aştiyê. Îngilîstanê jî kêfxweşiya ya ji peymanê anî ziman û serokwezîrê wê Boris Johnson got; "Ev peymaneke baş e û dê rê li ber aştiya di navbera Îsraîl û Filistînê de vedike."

Li aliyê din, ev peyman ji alî hin welatên din ve hate rexnekirin û wekî teslîmiyeta ji Îsraîlê re hate nirxandin. Ev yek bi taybetî ji alî hin aliyên filistînî ve wiha tê şîrovekirin.

Wekî tê zanîn bi salan e li ser mijara têkilîdanîna welatên ereb bi Îsraîlê re, her ew yek di nav ereban de wekî teslîmiyeta ji Îsraîlê re dihate nirxandin lewre jî tu welatên erebî nedixwestin ku bi rengekî aşkera têkiliyên xwe bi Îsraîlê re deynin. Hemû têkiliyên welatên ereban ên bi Îsraîlê re bi rengekî veşartî dihatin kirin.

Her wiha ev yek ji bo hin welatên din jî wiha bû. Wekî mînak di nav welatên Rojhilata Navîn ên herî zêde têkliya wan bi Îsraîlê re heye dewleta tirk e lê ew jî vê yekê zêde aşkera nake. Tevî ku bi dehan peyman di navbera van her du welatan de hene û bazirganiya di navbera wan de di asta herî bilind de ye, her tişt bi bêdengî û dizî tê kirin. Dema ev yek dibe mijara gotinê jî rayedarên dewleta tirk xwe wekî parêzvanên gelê Filistînê nîşan didin.

Bi her halî, her çendî ev peyman dê di nav civaka erebî de rastî nerazîbûnan were lê di heman demê de ew dibe pêvajoyeke nû û dibe ku rê li ber têkilîdanîna ereban bi Îsraîlê re veke.

# Krîza li rojhilatê deryaya Spî kûr dibe

Navenda Nûçeyan

Piştî vegera keştiyên lêgerîna li petrolê yên Tirkiyeyê bo rojhilatê deriyaya Spî ji gelek aliyan ve nerazîbûn çêbûn. Di serî de Yewnanistan û Fransayê gelek welatan nerazîbûna xwe aşkera kir. Li ser daxwaza Yewnanistan û Fransayê dê li Brukselê civînek di navbera welatên Yekitiya Ewrpayê (YE) de were lidarxistin. Wezîrên karên derve yên Ewropayê de di vê civînê de, dê li ser metirsiya pêşketinên leşkerî were rawestandin. Bi taybetî piştî ku keştiyên Yewnanistan û Tirkiyeyê li herêma binakok a di navbera her du welatan de hatin pêşberî hev. Her wiha di encamê de Yewnanistanê asta hişyariya xwe ya leşkerî bilind kir û Fransayê jî hin hêzên xwe yên taybet ji bo piştgiriya Yewnanistanê şandin Qibrisê.

Der barê mijarê de serokê Fransayê Emanuel Macron got ku ew ji van tevgerên hikûmeta tirk ên yekalî bi fikar in û divê rêyeke çareseriyê were dîtin. Fransa wekî din jî di encama peymaneke leşkerî de ya bi Qibrisê re, 2 balafirên xwe yên şer şandin baregeheke Qibrisê. Her wiha Yewnanistan û Amerîkayê jî li Viyanayê ji bo vê mijarê li hev civiyan, ji bo nîqaşên der barê gavên ku dê werin avêtin û lêgerîna li rêyên çareseriyeke dîplomatîk di navbera her du welatan de. Çav li rê ye ku piştî wê di dawiya vê mehê de li Berlînê civîneke berfireh bê lidarxistin û li riyên çareseriyeke aştiyane bigerin.



# Belgeyên sîxuriyê û planên hikûmeta Sûriyeyê

Navenda Nûçeyan

Di van demên dawiyê de rejîma Esad dixwaze li herêma Rêveberiya Xweser, tevlihevî û nakiyan di nav kurd û ereban de derbixe. Rejîm dixwaze hin kesên xuyayî yên wekî serokeşîrên ereb bikuje û kurdan bi wan kiryaran tawanbar bike da ku nakokiyê û şerê navxweyî li herêma ku di bin destê Rêveberiya Xweser de ye derbixin.

Saziyên ewlehiyê yên hikûmeta Sûriyeyê bi rêya komên çete yên veşartî û endamên îstixbaratê yên ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi cih kirine, hewl dide fitneyê di navbera gel û eşîrên ereb, di navbera gel û hêzên leşkerî de derbixe û serweriya xwe li herêmê vegerîne.

Hêzên Sûriyeya Demokratîk(HSD) di 29`ê gulana borî de bi dehan endamên wan komên veşartî girtin. Ji wan komeke veşartî girêdayî şaxa ewlehiya leşkerî ya bajarê Hesekê ye. Yek ji endamên komê yê bi navê Emar Ehmed Elî bi hedefgirtina kesên rûspî û derxistina tevliheviyê hatibû erkdarkirin.

Ji bo aşkerakirina wan aliyan, Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) bi rêzehevpeyvînên bi endamên wan koman re, gihîşt yek ji endamên wê komê da ku aliyên wan li herêmê bi kar tînin, erkên wan û armancên wan aşkera bikin.

Emar Ehemed Elî ji bajarokê Mergedeyê yê girêdayî kantona Hesekê ye û di sala 1985'an de hatiye dinê. Elî endamekî komeke girêdayî şaxên ewlekariyê yên rejîma Sûriyeyê ye.

Emar Ehmed Elî endamê komeke veşartî ya ku ji 6 kesan pêk tê ye. Ew kom girêdayî şaxa ewlehiya leşkerî ya hikûmeta Sûriyeyê li bajarê Hesekê ye.

Têkildarî armancên rejîma Sûriyeyê, Emar Ehmed Elî piştrast kir ku hikûmeta Sûriyeyê bi planên xwe dixwaze li herêmê bûyerên teqîn û hedefgirtinê pêk bîne; dixwaze sivîlan dûrî hêzên leşkerî bike; wan li dijî hêzên li herêmê sor bike û van bûyeran ji bo vegerandina serweriya xwe li herêmê bi kar bîne.

**Dixwazin tevlihev bikin**

Piştî ku li gundewarên rojhilatê Dêrazorê jiyan asayî bû, HSD'ê dest bi operasyonekê kir. Di encama vê operasyonê de çeteyên girêdayî aliyên dijber hatin girtin. Ew çete ji bo kuştina şêx û rûspiyan hatibûn erkdarkirin. Gelek aliyên hundirîn û derve hene ku dixwazin tevliheviyê di navbera pêkhateyên herêmê û eşîran de derbixin.

Şêxekî qebîleya Igêdat ê bajarokê Şihêlê Xilêf Şair der barê bûyerên li herêmê û armanca derxistina tevliheviyan de axivî.

Şair di axaftina xwe de wiha dibêje: "Hinek alî naxwazin ewlehiya herêmê çêbibe. Bûyerên ku di rojên dawîn de li bajarokê Şihêl derketin, bi destê gelek aliyên hundirîn û derve pêk hatin. Armanca wan derxistina tevliheviyê, xirabkirina aramî û ewlehiya herêmê bû."

Di van rojên dawiyê de di encama li xwe mukurhatinên sîxuran de derket holê ku rejîma Sûriyeyê dixwaze li herêmên Xweseriya Demokratîk bi rêya sîxuran nakokiyan di nav ereb û kurdan de derbixe



# Amerîka niha ji vê herêmê dernakeve

Li gorî nûçeyeke rojnameya New York Timesê generalê amerîkî Gen. Mekkeinz di bersiva pirseke der barê hebûna leşkerên amerîkî li Iraq û Sûriyeyê de wiha gotiye: "Ez texmîn dikim ku dê hêzên me demeke dirêj li Sûriye û Iraqê bimînin da ku şerê çeteyên DAIŞ'ê bike û destdirêjiyên Îranê yên li Sûriye û Iraqê asteng bike." Mekkeinz her wiha got ku piştî biryara serokê Amerîkayê Donald Tramp a vekişîna leşkerên wan ji Sûriyeyê, ji hezar leşkerî 500 leşker li wir mane.

Li aliyê din Mekkeinz di konferansa ewlekariyê ya komeleya aştiyê de, der barê mijarê de got ku li gorî baweriya wî ew dê heta hetayê li Sûriyeyê nemînin û dibe em hejmara leşkerên xwe kêmtir bikin lê di vê pêvajoyê de me hemû giraniya xwe daye ser şerê bi DAIŞ'ê re û em ê vê yekê berdewam bikin. Her wiha li gorî wî hîn jî çeteyên DAIŞ'ê di wê astê de ne ku dikarin li Sûriye û Iraqê êrîşan pêk bînin. Der barê hebûna leşkerên xwe yên li Iraqê jî wiha pê de çû: "Niha diyaloga me ya bi hikûmeta Iraqê re berdewam dike. Dibe em hejmara leşkerên xwe li wir kêm bikin lê ji bo berdewamkirina şerê li dijî DAIŞ û destwerdanên rejîma Îranê dê li wir bimînin." Wekî din jî diyar kir ku li Sûriyeyê dê şirîkatiya wan û Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) ya ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê bidome. ***WASHINGTON***



# Efrîniyên li Şehbayê banga bergiriyan kirin

Koçberên ji Efrînê yên li navçeya Til Rifetê ya kantona Şehbayê dimînin, bang li aliyên pêwendîdar kirin ku li kantonê bi temamî qedexeya derketina derve ferz bikin, derî û rêyên derbasbûna kantonê bigirin.



Li kantona Şehbayê vîrusa koronayê zû berbelav dibe û di vê der barê de Desteya Tenduristiyê ragihand ku 6 kesên din bi koronayê ketine. Heya niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 144 kes bi vîrusê ketine.

Koçberên ji Efrînê yên li Til Rifetê dimînin, tevî ku Şaneya Aloziyê ya Efrînê li kantona Şehbayê qedexeya derketina derve ragihandiye jî lê dîsa zêde xwe ji vîrusê naparêzin.

Li navçeyê derdora 16 hezar koçberên ji Efrînê dimînin. Ew li ser 16 komînan hatine belavkirin. Têkildarî mijarê ANHA'yê hevdîtin bi çend şêniyan re kirin û şêniyan piştrast kir ku vîrus zû belav dibe, lewma parastina ji vîrusa koronayê girîng e. ***HELEB***

# Senatorê Amerîkayê banga ferzkirina cezayan kir

Senator Robert Menendez, Chris Von Hollen û wezîrê karên derve Mike Pompeo diyar kirin ku pêwîst e bi Yekitiya Ewropayê (YE) re ji bo ferzkirina cezayên giştî û hevpar li dijî aboriya dewleta tirk hevpar bin.

Robert Menendez û Chris Von Hollen di nameya xwe de ya ji wezîrê karên derve Mike Pompeo re ku beriya civîna Pompeo bi wezîrê karên derve yê Yewnanistanê Nikos Dendias re hate belavkirin, got: "Heke dewleta tirk tevgerên xwe yên derqanûnî li rojhilatê deryaya Spî bidomîne, divê DYA û YE bi lez planekê ji bo ferzkirina cezayên hevpar û giştî li ser warên sereke yên aboriya dewleta tirk ferz bikin."

Dewleta tirk û Yewnanistan endamên NATO`yê ne û ji ber rageşiyên girêdayî herêmên aborî li rojhilatê deryaya Spî bi nakok in. Piştî ku dewleta tirk keştiyeke lêkolînê şand herêma binakok, Pompeo û Dendias civiyan.

Her wiha her du senatoran got: "Divê Pompeo tevahiya tedbîrên pêwîst bigire da ku dewleta tirk neçar bike ku keştiyên xwe ji herêma aborî ya taybet a Yewnanistanê derxe û qanûnên navdewletî yên girêdayî di vî warî de pêk bîne."

Robert Menendez û Chris Von Hollen wiha domandin: "Heger DYA di vî warî de û di vê dema krîtîk de bi bin ket, dê asta nakokiyê mezintir bibe."

Dewleta tirk û DYA li ser kirîna Enqereyê ya pergala moşekan S-400 a Rûsyayê bi nakok in. Washington piştrast dike ku ev pergala Rûsyayê ne li gorî pergala parastinê ya NATO'yê ye. ***WASHINGTON***



# Rewşa jin û zarokên êzidî yên ji DAIŞ’ê rizgarbûyî

→ **Şaswar Mame**




Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî (Amnesty) der barê jin û zarokên ji destên çeteyên DAIŞ’ê hatine rizgarkirin bi sernavê “Mîrateya Terorê: Rewşa Xirab a Zarokên Êzidî Yên Ji DAIŞ’ê Rizgarbûyî” amade kiriye û ragihandiye. Ev rapor ji 64 rûpelan pêk tê. Amnestyê bi 29 zarokên rizgarbûyî yên ji hêla DAIŞ'ê ve dîl hatibûn girtin, bi 25 endamên malbatê ku zarokên rizgarbûyî xwedî dikin û bi 69 kesên din re hevpeyvîn kir. Ev jî beşa duyemîn a vê raporê ye.

Dê û bav û endamên malbatê yên zarokên ji dîlgirtina DAIŞ’ê rizgarbûyî ji Amnestyê re gotine ku wan di pêkanîna pêwîstiyên van zarokan de zehmetî kişandine. Gelek malbatên êzidî feqîr bûne – beşek jî ji ber ku wan bi hezaran heta bi deh hezaran dolar pere wek fîdye dane ji bo ku wan zarokan û endamên din ên malbatê ji dîlgirtina DAIŞ’ê rizgar bikin. Xebatkarên karê mirovî her wisa behsa tunebûna bernameyên ji bo perwerdekirina dê û bav û xwediyan, der barê tiştên zarokên wan dijîn an jî der barê bê ka çawa piştgiriyê bidin zarokan piştî vegera wan, kirine.

Têkildarî gelek dijwariyên ku zarok di entegrebûnê de dijîn û rewşa bi zehmetî ya xwedîkirina wan zarokên rizgarbûyî, çend xwediyan neçariya rewşê aniye ziman. Wek mînak, Arzan ê kurê wî yê 14 salî pir hêrs dibe, hîperaktîf e û xwedî helwestên hêrsok e, gotiye: “Li destpêkê, min xewn didît ku ew vedigeriya ba min. Piştre gava ew vegeriya û hat, min bi wî re qet daneke normal derbas nekir, qet bîskeke normal derbas nabe... Çi tişt ji wê xirabtir nabe."

**Jinên zarok anîne**

Beşek girîng a raporê hatiye terxankirin, ji bo jinên êzidiyên ji hêla DAIŞ’ê ve hatin revandin û di encama tundiya cinsî de zarok anîne. Amnesty dibêje, “Ew jin rastî zehmetiyên mezin tên. Gelek ji wan bi zorê ji zarokên xwe hatin veqetandin ji ber zextên dînî û civakî û lewre di rewşeke pir xirab a derûnî de ne.”

Wek encama polîtîkayên DAIŞ’ê yên tecawiza sîstematîk û kolekirina cinsî, jinên êzidî di heyama dîlgirtina xwe de bi sedan zarok anîn dinyayê. Ji ber sedemên gelek faktoran, di serî de jî ji ber helwesta Meclisa Bilind a Rûhanî ya Êzidiyan ku fermanê dide çi zarokên ku bavên wan misilman an jî "nayên zanîn" divê wek misilman bên qeydkirin, ew zarok di nav civaka êzidî de nayên pejirandin. Lewre ew jin hatin mecbûrkirin ku an zarokên xwe xwedî bikin bes terka malbatên xwe bikin, an jî terka zarokên xwe bikin da ku bi malbat û civaka xwe re dîsa bibin yek.

Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî di rapora xwe de van tiştan parve dike: “Li gor qanûna navneteweyî, hemû zarok bêyî tawanbarî xwedî mafên tenduristî, perwerde, nasnameya fermî û yekitiya malbatê ne. Zarokên bûne qurbaniyên binpêkirinên mafên mirovan û qanûnên navneteweyî yên mirovahiyê xwedî heqê tezmînatê yê tam in. Divê rayedarên neteweyî û civaka navneteweyî demildest tevbigerin da ku jinan bi zarokên wan ên bi tundiya cinsî çêbûne bigihîne hev, veqetandinên li pêşerojê asteng bike û pêşekiyê bide wan jin û zarokan ji bo ji nû ve bicihkirinê an jî niştecihkirina mirovî.”

Çalakvanên civaka sivîl û xebatkarên rêxistinên mirovî yên lokal û navneteweyî ji Amnestyê re ragihandine, berteka civaka êzidî ya der barê vê pirsgirêkê de tevlihev e. Her ku gelek mirovên di nav civakê de bi awayekî tund li dijî qebûlkirina wan zarokan in ku di encama tundiya cinsî de hatine dinyayê, yên mayî dil hene ku wan qebûl bikin, bi taybetî jî eger nîşaneyeke erênî ji rayedarên dînî bibînin. Dîsa jî mirovên mayî ji bo wan jinan û zarokên wan xwedî hezkirin in û di vê baweriyê de ne ku divê ew alîkariyê bibînin lê li gor rê û rismên êzdatiyê, ew nikarin di nav civakê de ji xwe re cihekî bibînin.

Gelek ji wan jinan di rewşên neçar de ne; di hin bûyeran de tê dîtin ku ew êşeke derûnî dikêşin piştî ku bi zorê ji zarokên xwe hatine veqetandin û hinekên din jî, li kampên koçberan an jî bi girtiyên DAIŞ’ê re dimînin da ku terka zarokên xwe nekin. Çend jinên wiha ku ji hêla Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî li gel wan hevpeyvîn hatiye çêkirin gotine ku ew dane zorê, mecbûr hiştine an jî hatine xapandin ji aliyê endamên malbatê an jî ji aliyê takekes an jî komên mirovan ên hewl didin jin û zarokên êzidî bigihînin malbatên wan, da ku zarokên xwe şûnde bihêlin. Wan jinan her wisa gotiye ku wan kesan ew bi derewan îqna kirine ku ew ê di rojên pêş de bikarin zarokên xwe bibînin û bigihîjin zarokên xwe.

**'Keça xwe ji bîr bike'**

Hanan, jina 24 salî ya ji dîlgirtina DAIŞ'ê rizgarbûyî, ji Amnestyê re gotiye: “Mamê min li ser şeref û namûsa xwe soz da min ku çi wextê ez bixwazim êz ê bikarim serlêdana keça xwe bikim. Min ew bir danî sêwîxaneyê. Wextê min ew danî wir ez bi ser wan de qîriyam û min got, ‘Zaroka min nedin tu kesî. Ez ê her hefte, her heyv dîsa werim, – ew rewş dê derbas be!’ Wexta min mamê xwe dît, gotinên wî yên ewilî ew bûn, 'Keça xwe ji bîr bike’."

**‘Hestiyê pişta min şikest’**

Sana, jina 22 salî ya ji dîlgirtina DAIŞ’ê rizgarbûyî, keçika xwe bi xwe biriye kampa Koçberên Navxweyî lê mecbûr maye ku terka wê bike piştî ku bi dubareyî gefên kuştinê li wê hatine kirin. Wê jî wiha gotiye: "Min ew bir cem rêxistineke sivîl a lokal û wan gote min ku ez keça xwe bihêlim... Wan got: ‘Em ê ji bo wê bibin dê û bav.’ Tam di vê wextê de min wisa hîs kir ku hestiyê pişta min şikest. Gewdeya min rûxiya.”

Hemû jinên ku Amnestyê hevpeyvîn bi wan re çêkiriye ên ji zarokên xwe hatine veqetandin gotine ku wan nekariye xwe bigihînin zarokên xwe, an jî rêyeke danûstandinê nedîtine û ne jî agahî ji wan standine. Wan jinan her wisa gotiye ku wan nekariye der barê daxwaza gihîştina bi zarokên xwe de li gel malbat û civaka xwe biaxivin, ji ber fikarên têkildarî ewlehiya xwe.

Trawmaya ku ew malbat ji ber veqetîna ji dê û bavên xwe dijîn hîn zêdetir acizî bi xwe re anîne. Gelek ji wan hatin zorlêkirin da ku terka zarokên xwe bikin an ji bo berdana wan hatin xapandin. Ew bi tu awayî nikarin bi wan re têkiliyê çêbikin, der barê siheta wan de tu agahî nestandin. Di nav malbat an jî civaka xwe de nikarin hîsên xwe yên der barê xemgîniya xwe de parve bikin. Di vê mijarê de ne alîkariya psîkososyal standine û ne tu kes piştgirî daye wan da ku bi zarokên xwe re bên ba hev û di vî warî de jî hêviya wan pir kêm e.

Çend jinan ji Amnestyê re gotiye ku wan hewl daye xwe bikujin. Hinekan ji yek carê zêdetir ew tişt pêk aniye. Hemûyan jî daxwaza çareseriyê li civaka navneteweyî û rayedarên neteweyî kiriye.

**‘Êşê bidin ber çavên xwe’**

Janana 22 salî ya ji dîlgirtina DAIŞ’ê rizgarbûyî gotiye: "Ez dixwazim ji civaka xwe re û ji hemû kesên cîhanê re bibêjim ku ez di bextê we de me, me û zarokên me qebûl bikin. Em ji DAIŞ’ê rizgar bûne. Êşa me kişandî bidin ber çavên xwe... Min nedixwest pitikek min ji wan mirovan çêbibe. Ez mecbûr kirim ku kurekî bînim. Ez ê tu car nexwazim ku bi bavê wî re bijîm lê ez pêwîstî dibînim ku bi kurê xwe re bijîm.”

**Çalakiyên pêwîst**


Rêxistina Lêborînê ya Navneteweyî di dirêjahiya rapora xwe de behsa van çalakiyan dike ku divê werin kirin: “Rayedarên neteweyî divê misoger bikin ku kurik û keçikên rizgarbûyî û her wiha xwediyên wan jî daxilî nav pîvanên tezmînatê bibin ku ji bo êzidiyên bûne qurbaniyên DAIŞ’ê hatine terxankirin. Ji bo ku berpirsiyariyên xwe yên der barê wan zarokan de pêk bînin, divê ew bi piştgiriya tevkaran, rêxistinên navneteweyî û navxweyî, bi taybetî çareseriyê ji bo tenduristî û pêwîstiyên psîkososyal ên wan zarokan bibînin, cihê ku lazim be perwerdeya kurdiya kurmancî bidin wan, derfetên ji bo xwe gihandina bernameyên perwerdeyê yên lezgîn bi awayekî berfireh dabîn bikin, astengiyên li pêş bidestxistina belgeyên sivîl ên nû yan jî derfetên veguhastina wan ji holê rakin û piştgirî û perwerdeyê bidin wan hemû xwediyên ku xwedî li zarokên rizgarbûyî derdikevin. Ji bo zarokên rizgarbûyî yên seqetmayî, seqetiyên fîzîkî û psîkososyal jî tê de, rayedar divê misoger bikin ku ew bêyî tawanbarî bikaribin bigihîjin hemû mafên xwe ku tê de mecbûriyeta dabînkirina avahiyên bikêrhatî jî heye.”

Di rapora Amnestyê de ev tişt jî tê gotin: “Rayedarên hikûmeta navendî ya Iraqê û yên HHK’ê, bi xebata li gel rêxistinên navneteweyî û navxweyî, divê gavên pêwîst bavêjin da ku rewşa jinên êzidî yên zarokên bi tundiya cinsî ya ji hêla endamên DAŞI’ê ve anînê dinyayê çareser bikin. Ji her tiştî bêtir, ji jinên êzidî yên dixwazin bi zarokên xwe re bimînin an jî bigihîjin zarokên xwe destûr divê bê dayîn, alîkariyê bidin wan û piştgiriya wan di vî warî de bê kirin û veqetandinên pêşerojê yên wan jin û zarokan bên astengkirin. Saziyên navneteweyî yên wek Komîsyona Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî (UNHCR-NY) divê bi hikûmetên biyanî re tevkariyê bike da ku piştgiriyê bidin wan jin û zarokan û rewşa wan zûka bê şopandin ji bo ji nû ve bicihkirinê an jî niştecihkirina mirovî.”

Ev rêxistina navneteweyî ya mafê mirovan tekez dike ku divê rayedarên iraqî hemû qanûnên Iraqê yên têkildar biguherînin da ku jinên êzidî yên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne, bikaribinn dînê ku zarokên wan lê hatine qeydkirin vebijêrin. Û rêxistinên navneteweyî û navxweyî divê misoger bikin ku jinên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne yên li kampên penaberan ên li Suriyeyê dijîn jî ji mafên xwe yên mayîna bi zarokên xwe agahdar bin û ji bo saziyên navneteweyî yên wek UNHCR’ê bên sewqkirin da ku ji nû ve bên bicihkirin.

Di rapora Amnestyê de her wiha ev tişt jî hatiye gotin: “Tevî ku kabûsa revandina ji hêla DAIŞ’ê ve, kolekirin, îşkence û destdirêjiyên din ji bo zarokên êzidî yên rizgarbûyî û ji bo jinên xwedî zarokên bi tundiya cinsî çêbûne, bi dawî hatibin jî zehmetiyên wan hîn jî didomin. Rayedarên neteweyî divê niha berpirsiyariyên xwe bi cih bînin, tezmînatên ku dê piştgiriyeke watedar, kêrhatî û dem-dirêj dabîn bikin jî di nav de.”

*(Dawî)*



# Xaye çinêkerdişê civaka kurd o

Mehmet Şahîn

Hukmatê AKP-MHPyî konseptê çinêkerdişê kurdan ê serra 1930'an esas gena. Êy konseptan de qirkerdişo fizikî û qirkerdişo sipê esto. Coka çar hetan ra hêrîşê civaka kurd kenê. Hêrîşê nirx û rûmetanê kurdî, çanda kurdî, ziwanê kurdî û xwezaya Kurdistanî kenê.

Komara Tirkîya ser çinêkerdişê civaka kurd awan bîya. 1924'an ra nata heme sîyaset û polîtaqayanê xo serê çinêkerdişê kurdan awan kenê. Kurdan çiqas qarşî sîyasetê înan ê çinêkerdişê sere wedarto o her raye bi qirkerdişanê xidaran re ri bi ri mendê.

Sîyasetê çinêkerdişê kurdan bi îmzekerdişê peymanê Lozanî dest pê keno. Soz û bexto ku M.Kemalî dabîy kurdan heminan xo vîra kenê. Makeqanûno ke 1921'î de amebî nûştiş de esbîyayîşê kurdan û xoserîya civaka kurd qebûl kerd be. Badê peymanê Lozanî serra 1924'an de makeqanûnêko newe nûsnenê. No makeqanûno newe de estbîyayîşê kurdan ca nêgeno. Çinêkerdişê kurdan û tirkistankerdişê Kurdistanî esas yeno girotiş.

Qarşî na sîyasetê çinêkerdîşî de serewedarnayîşê kurdan o verîn serra 1925'î de bin pêşengîya Kalê Şêx Seîdî de pêk yeno. Dewleta tirke no serewedarnayîşî kena hincet û koseptanê xo yê çinêkeridişê kurdan yew bi yew kena merîyet. "Islehkerdişê Şerqî", "Takrîrî Sikun", "Tedîp û Tenkîl", "Pergalê Mufetîşîyê Umumî", "Pergalê Rewşa Awarte (OHAL) û waliyê heremî yê rewşa awarteyî" nê heme namê konseptanê çinêkerdişê civaka kurd o. Xayê nê heme konseptan teslîm girotiş û çinêkerdişê civaka kurd o.

Çiqas qirkerdişo fizikî û qirkedişo sipê kurdan ser zêde bî, endêk serewedarnayîşê kurdanî ke zêde bîy. Badê serewedarnayîşê Kalê Şêx Seîdî bi desan serewedarnayîşî virazîyayî. Nê serewedarnayîşan de kurdî qadê şerî de û şer de çi rey bin nêkewtî. Heme bi îxanetê kurdan û bi xapênayîşanê selahîyetdaranê dewleta tirke bi awayeko bê encam bi binkewtişê kurdan qedîyayî. Selahîyetdarê dewleta tirke bi soz û bext qabê muzakereyan rayberê serewedarnayîşan wendê ser masa û bi bêbextî dest û lîng înan girêdê û eştê zîndanan. Her ray bi no awayî şexsê rayberan de hêvî û bawerîya civaka kurd şikna û civaka kurd bi qirkerdişê giranan re ri bi ri verda ya.

> Bêtehamulîya qarşî ziwanê kurdî bêtehamulîya qarşî estbîyayîşa civakê kurd o

Serewedarnayîşê kurdan o peyîn bin Rayberîya Rêzdar Ocalanî de serra 1978'an de dest pê kerd. No serewedarnayîşî nêşibêyê serewedarnayîşanê verînan. Dewleta tirke heme teknîk û îmkananê xo û yê NATO seferber kerde, la nêşika nê serewedarnayîşî bişikina. Heme dek û dolabê xo yê verînî cerebna, heme ray û raybazê îxanetan cerebnaye, la rayna nêşika nê xoverdayîşê peyînî bişikna. Raya ewilo ke serewedarnayîşê kurdan bi des serran (40 ser) dewam kerd. Raya ewilo ke dewleta tirke karşî xoverdayîşê kurdan bêçare mende û kewete tengayî.

Dewletanê Emperyalîstan ê ke 100 serrî verê joy Kurdistan eşt be çarmix û qirkerdişê kurdan temaşe kerdê, vînayê ke xoverdayîşê kurdan zor dano dewleta tirke û tastatukoya ke 100 serrî verê joy înan awan kerdê çinêbayêne xo risna hewara dewleta tirke. Heminan dest da jobînan û bi qompoloyêko xayin û bêbext serra 1999'an de Rayberê Şarê Kurdî Ocalan dîl girotî û teslîmê dewleta tirke kerdî.

Wexto ke serra 1999'an de Rayberê Şarê Kurdî Ocalan dîl ame girotiş dewleta tirke vat ke qey henî xoverdayîşê kurdan qedîya. Dewleta tirke waşte ke şexsê Rêzdar Ocalanî de aqûbetî serewedarnayîşanê verînan bîyara serê xoverdayîşê peyînî. La Rêzdar Ocalan kesê ku şareza bî. Seyin ke xoverdayîşo peyîn nêşibeno xoverdayîşanê verînan Rayber Ocalanî zî qet nêşibeno rayberanê serewedarnayîşanê verînan. Rayber Ocalanî xayê dewleta tirke baş zanê. Coka dewleta tirke nêşika Rayber Ocalanî teslîm bigera û di şexsê êy de qedera nebixêr dibare bikera.

Badê ke hukmatê AKPyî vîna nêşikena Rêzdar Ocalanî teslîm bigero û di şexsê êy de xoverdayîşê kurdan biqedêno, dest eşt sîyasetê xo yê xapênayîşî. Hukmatê AKPyî rîyê xo yo qirker o raşt xêlî kerd, bi rîyêko bîn û zureker, binê namê çareserîye de fina heme serok û rayberanê kurdan ê verînan waşt Rêzdar Ocalanî ke bixapêno û xoverdayîşê kurdan biqedêno.

Heman wextî de qabê ke şarê kurdî bixapêno û xoverdayîş ra dûrî fîno tay gamê xapinokî yê bê qanûn eştî. Qaşo TV yo kurdî kerd a, destûrê akerdayîşê qursanê kurdî da, zanîgehan de beşê ziwanê kurdî kerd a… la enê heme bê qanûn û bê bingeh bî. Çimkî mezgê dewlete de estbîyayîşê civaka kurd çinêbî û o mezg nêbedelîya bî. Xaye rayna xapênayîşê kurdan bi. La vîr û bawerîya Rêzdar Ocalanî destûr nêda sîyasetê xapînok a zureker serbikewo.

Rêzdar Ocalanî bi sîyasetêko zanayî bi mutabaqatê Dolmabahçe yê 28 sibata 2015'ine hukmatê AKP'yî neçar kerd ke gamê çarserîyêk raşt berzo û yay ke xêliyê ser rîyê xo rono û rîyê xo yo qirker o raşt veco teber. Qabê ke nîyetê selahîyetdaranê AKP'yî xapênayîş bî û xayê înan nê çarserîyêka bi rûmet bî, neçar mendî xêliyê xo berzê û rîyê xoyê raştî yê înkar û qirkerî vecê teber.

Hukmatê AKP'yî bi redkerdişê mutabaqatê Dolmabahçeyî xêlîya ser rîyê xo eşt û sîyasetê Îtîhat Terakî, konseptê serra 1930'an, zihnîyetê Mahmut Esat Bozkurtî vist merîyet. Mahmut Esat Bozkurtî vatê, 'no welat de vîşêrê tirkan heqê ti kesî çinîyo, heke heqêk înan bibo oy zî xulamîya tirkan o'. Nîyetê hukmatê AKP'yî çinêbe heq bido kurdan û kurdan 'statuya xulamî'ra veco. Coka badê ke xêlîya rîyê xo eşt û rîyê xo yo raşt vet teber lezalez gamê ke qabê xapênayîşê civaka kurd eştîbî yew bi yew rapey girot û geno.

Ê gaman ra yew zî zanîngehan de akerdişê beşê ziwanê kurdî bî. Du xayê akerdişê yê beşan bibî. Yew û ya herî muhîm astengkerdişê xebatanê qada ziwanî (TZP-Kurdî) bî. Binê sêwanê TZP-Kurdî de Kurdî-Der û Ensitutîyan xebatê zaf muhîmî kerdê û qada ziwanî de însiyatîfê gird awan kerdî. Dewlete bi akerdişê yê beşan waşte însiyatîfê TZP-Kurdî bişikna û xebatanê ziwanê bikera bin însiyatîfê xo. Xayo diyine çarcoweyê çarserîya zurekere de xapênayîşê civaka kurd bî.

Bi redkerdişê mutabaqatê Dolmabahçe û bi destpêkerdişê şerê topyekunî ra û bi sayê firsendê 'derbeya lutfê Homayî' ra heme sazî û rêxistinê ziwanî ameyî desteserkerdiş. Heme xebatê ziwanê Kurdî ameyî qedexekerdiş û însiyatîfê TZP-Kurdî ame şikitiş. Yanî bi kilmî nika nê wirdî xayeyî akerdişê beşê ziwanî kurdî çênêbiyê. Loma nika wazanê yê beşanê ziwanê kurdî yê ku akerdê yew bi yew bigerê.

Serêk verêjoy waştî ke beşa Zanîngeha Artûklû ya Mêrdîne bigerê, la badê ke çapemenî de ca girot û civaka kurd bertek nîşan da neçar mendî rapey gam berzê. Zanê ke bi awayêko fermî qerarê girotişê yê beşan zehmet o, coka bi dek û dolaban û pratîk de wazenê estbîyayîşê yê beşan bê mane bikerê. Beşa kurdî de qedexekerdişê 'Tezo Kurdî' û di beşa kurdî de dayîşê dersan a bi tirkî bêmanekerdiş û di pratîk de girotişê yê beşan o.

Badê desteserkerdişê şaredarîyan sere de hêrîş kerdişê tabelayanê kurdî yê serê şaredarîyan û namê kurdî yê ser park û sazîyan, hêrîşkerdişê sazîyanê ziwanî û girotişê yê sazîyan, desteserkerdişê TV, rojname û heme sazîyanê çapemenîya kurdî, girotişê dibistan û krêşanê kurdî, hêrîşê ser goristanan û şikitişê kêlikan ê ke bi kurdî ameybî nûştiş, meclîs de qebûlnêkerdişê ziwanê kurdî, kolanan de kiştişê ciwananê kurdan ê ke bi kurdî qalî kenê û kurdî muzîk goşdarî kenê, mudaxalekerdişê cayê şînan û astengkerdişê wendişê mewludo kurdî, badê desteserkerdişê şaredarîyan girotişê malperanê kurdî yê şaredarîyan, badê dagirkerdişê Efrînî qedexekerdişê ziwanê Kurdî û bedelnayîşê tabelayanê kurdî, zîndanan de qedexekerdişê ziwanî û nêdayîşê nameyanê kurdî, heme nîşan danê ke konseptê çinêkerdişê civaka kurd bi heme xidarîya xo meriyete de ya. Bi kilmî xaye tenê çinêkerdişê xoverdayîşê kurdan nîyo, xaye çinêkerdişê civaka kurd bi xo yo.

Selahîyetdarê dewleta tirke zanê ke heta ziwanê Kurdî bibo çênêkerdişê civaka kurd mimkun nîyo. Zanê ke çinêkerdişê civakan bi çinêkerdişê ziwanî mimkun o. Coka çarhetan ra hêrîşê ziwan û çanda kurdî kenê. Bêtehamulîya qarşî ziwanê kurdî bêtehamulîya qarşî estbîyayîşê civaka kurd o.

Selahîyetdarê dewleta tirke qaşo xo ra vanê ma misilmanê û ma birayê yewbînan ê. La kurdê ke Homay înan viraşto û ziwano ke Homay dayo kurdan qebûl nêkenê, wazenê çinê bikerê. Bi ênê nizdîbîyayîşê xo qarşî Homayî vecyenê. Wexto ke mesala bena kurdî, misilmanîya înan qedîyena û Homay ke nêşinasnenê.

Seyin dewleta tirke çinêbîyayîşê civaka kurdî çênêbîyayîşê ziwanî de vînena, hewceyo şaro kurdî ke estbîyayîşê xo ziwanê xo de bivîno û bi israr ro ziwanê xo wayîr veciyo û ganî heme qadan de ziwanê xo bipawo. Bêguman pawitişê ziwanî bi qalkerdiş û bi mûsnayîşê gedanê xo mimkun o.

Hewceyo ma xo vîr ra nêkerime ke estbîyayîşê ziwanî estbîyayîşê ma yo, pawitişê ziwanî pawitişê xo yo.

# Penîrê dayê




Silav ji xwînerên Xwebûnê re! Wekî hûn jî dizanin ez li ser medyaya civakî vîdyoyan çêdikim. Carna tiştên ecêb jî tên serê min, ez dixwazim behsa du meseleyan bikim.

Hevalê min, navê wî Ûsiv e. Ev hezar sal e hej jinekê dike. Rojekê di vîdyoyeke min de lîst. Di vîdyoyê de dibêje, “Tu pîs î lê ez jî bênamûs im.” Piştre meh diborin, sal derbas dibin... Rojekê diçin xwezgîniyê; bedlê xwe li xwe dike, diya xwe jî pişta xwe dixirxirîne, diçin xwezgîniyê. Ûsiv ji vîdyoyên min nas dikin û dibêjin hûn herin malê em ê we agahdar bikin. Malbata keçikê ji wan re gotibû em keçika xwe nadin bênamûsan! :) Replîk bû bela serê lawik.

Di vîdyoyeke min de penîr ji gund tê. Ji welêt, diya min ji min re dişîne lê di nav vîdyoyê de yên penîr dixwin jehrî dibin û nebê diya min jî vê vîdyoyê temaşe dike. Diya min telefonê min dike dibêje tu çima nabêjî penîrê diya min zehf xweş e? Hemû cîranan ji diya min re gotiye, Deno behsa penîrê te kiriye, xelk jehrî bûye û diya min hêrs bûbû û gotibû bila çavên min bi Deno nekeve! Mehekê ez neçûm malê. Min digot dayê ew fîlm e, ne rast e em vîdyoyê dikşînin. Îlah digot na tu yê careke din vîdyo bikişînî û bibêjî penîrê diya min zehf xweş e! Ji tirsa êdî di vîdeoyên xwe de behsa diya xwe nakim..

**Deniz Ozer (Deno)**




# Kemîna nobedar




Rojekê lojîstikçiyê erzaq êdî bêzar dibe, ji ber ku her şev hinek dikevin mitbexê û erzaqan dibin. Ji ber vê lojîstîkçî dibêje ez ê kemîn deynim, kîjan heval were ez ê wî zeft bikim. Planek wisa çêdike, dibêje ez ê herim xwe bixim bin çadira ku avêtiye ser tenekeya penîr, zeytûn û tehînê. Bi şev saet dibe dozdeh, lojîstîkçiyê me diçe xwe dike bin çadirê. Dibêje hebe nebe her seatê nobetê nobedar tên erzaqan dibin. Kîjan were ez ê wî zeft bikim. Saet dibe yek kes nayê, dibe dudu kes nayê; êdî xew zorê dide wî, hewl dide ku rabe guhê xwe dide derva, meyze dike deng tê, zûka bêdeng guhdarî dike ku deng nêz dibe piştî du sê deqîqeyan ew kes dikeve hundirê mitbexê. Lojîstikçiyê me jî di bin çadirê de bê deng di kemînê de ye lê guhdarî dike.

Lojîstîkçî dişopîne ku ew kes êdî ketiye mitbexê bi torbeyê şekir û rûnê xwarinê re mijûl e. Êdî lojîstîkçiyê me dibejê ez ê hem sizmacî deşîfre bikim hem jî piçekî wî bitirsînim û bêyî ku çadira ketî bin rake bang dike û wisa dibêje: “Xwe newestîne penîr, zeytûn, tehîn li wir in lê berî her tiştî tu rapora xwe ya rexnedayînê binivîse.” Çawa wisa dibêje hirçê ketiye hundir dike kufînî. Lojîstikçiyê me jî di heman demê de fêm dike ku ev ne heval e lê hirç e û ji tirsa heya ku hêza wî heye dike qêrînî. Bi qêrîniya heval re hirç jî vedicinîqe û dibe orîniya wî. Xirecirek dikeve nav mitbexê hirç ji tirsa direve lê lojîstikçiyê me hîn jî dike qêrînî û hawar. Vêca nobedarê şevê hema bi lez tê hawara lojîstîkçiyê me û dibêjê, "Heval heval çi bû ji te." Lojîstîkçî tê ser hişê xwe û dibejê, "Tu zanî heval gavek din min ji hirçekî rapora rexnedayînê xwest." Nobeçiyê me jî bi kenekî bilind dibêje, "Dibe ku tu pir hişk bi ser de çûyî heval, ji ber wê rexneya te qabûl nekiriye."

*Heval Mistê*

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Alava ku berê ava vexwarinê dixistin navê 3. Xapandin, hîle 5. Çêlek (bi kirmanckî) 6. Iftîra 7. Rewş 9. Hêminî, aramî, aştî 12. Qudûşî 14. Notayeke muzîkê 15. Bi nav û deng, naskirî 17. Notayeke muzîkê 18. Tûj 22. Bajarekî rojhilatê welêt, kaniya xwîna şehîdan

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Hin giyanewerên ku mirov wan nabînin
2. Pepûk, bêmecal
3. Notayeke muzîkê
4. Bersiva neyînî
5. Pêxemberê oleke kevanar ku ji holê rabûye
7. Xeberdar, têgihiştî
8. Şînkahiya ku zebeşan digire
10. Cebhe, qada şer
11. Derveyî hizûrê
13. Daxuyanî, dengî, reklam
14. Salveger
16. Xalî, ne tijî
19. Dînî, ayinî
20. Xebat û xwêdana mirov
21. Alaveke muzîkê ya têlî
23. Hewa

**Bersiva hefteya borî**





# Çand û parastin

Rohat Ararat

Di pêvajoya herikîna dîrokî ya pêşketina civakbûyînê de, ji hemû hilberîn û afirîneriyên jiyanê re çand tê gotin. Parastina vê çandê ya ji bo nifşên din jî gelekî girîng û bi wate ye. Bi sehkirin, hîskirin, fikirîn û ramyarî afirîneriya berhemên şênber û razber ên çandî pêşketina hiş û hişmendiya civakî îfade dike. Hilberîn û afirîneriya mirov û civakê ya madî û manewî, ji ziman bigire heta ol, wêje, muzîk, xwarin û vexwarin, cil û berg, kevneşopî, star û niştecîhiya bi hev re, çandinî, cotkarî û sewalkarî hemû jî parçeyên çandê ne.

Bêguman çand û jiyana her neteweyê ji hev cuda ye. Li gorî erdnîgar, şert û mercên jiyanê jî diguhere. Jiyana neteweyan jî li gorî hilberîn û afirîneriyê dibe xwedî nasname. Nasname di heman demê de dibe wêneyê neteweyî. Her mirov jî di heman demê de bi jiyana xwe temsîliyeta neteweya xwe dike. Jêderk an jî derbûna jiyana mirov, civak, an jî neteweyekê çand e. Çand, nasîn û nasnameya wê neteweyê ye.

Li cihekî jiyana mirov û civakê hebe, li wê derê çand bi pêş dikeve. Jiyana bi hev re bixwe jî çand e. Di çarçoveya jiyana bi hev re de, pêşketina çandê pêkan e. Ne gengaz e ku mirovek bi serê xwe çandekê biafirîne. Lewre ew fêm û hişê heyî yê mirov ji civakbûn, hiş û bîra wê civakê tê. Dibe ku kes bêje min berhemeke çandî, hunerî, folklorî û hwd. afirand lê belê afirandina wê berhemê ji hişê civakê tê.

Di amojgariya çanda civakê de hilberîn li ser bingeha hişekî kolektîf bi pêş dikeve. Li ser bawerî, nirxdayîn û watebarkirinê afirîneriyek derdikeve holê. Di dîroka gelan de neteweyeke bêyî çandê wekî netewe nayê pejirandin. Di cîhanê de her neteweyek rengek e, dengek e û dewlemendiyek e. Wekî guleke li gulistanê; gulistan bi rengîniya hemû gulan xweşik dibe, bi wate dibe û dibe gulistan.

Em bala xwe bidinê di dîrokê de tu carî çandeke azad û li ser amojgariya xwe mayînde bi pêş neketiye. Her tim destwerdan ji aliyê serdest, dewlemend û hêzdaran ve pêk hatiye. Di hin serdemên dîrokê de jî di bin serweriya kevneperest, paşverû û olperestan de li paş maye. Gelek caran hatiye qedexekirin û tunekirin. Kesên xwestine çanda xwe biparêzin, bi pêş bixin ji aliyê paşverûyan ve wekî gunehbar hatine tawanbarkirin.

Li erdnîgariya ku em lê dijîn ango li Kurdistanê çand hatiye binpêkirin. Çawa ku mafê her mirov û neteweyê heye bi çanda xwe bijî, yê civaka kurd jî heye li Kurdistanê bi awayekî azad bi çand, ziman û baweriya xwe bijî. Çand, ziman û baweriya civakekê mafê herî rewa û xwezayî ye; lewre nasname û hebûna neteweyî ye. Civaka kurd jî divê çarenûsa xwe ew bi xwe diyar bike, bi çanda xwe bijî û wê biparêze.

Parastina çand û baweriya xwe di heman demê de parastina hebûna xwe ye. Em tenê behsa baweriyeke îlahî nakin, her wiha behsa baweriyeke nirxî dikin. Îro hemû erdnîgariya Kurdistanê bi şûnwrên xwe yên dîrokî û pîroz bi hemû xwezaya xwe tê wêrankirin, talankirin û tunekirin. Mirov an jî ew civaka ku çand, bawerî û nirxên xwe neparêze nikare hebûna xwe jî biparêze. Hebûneke neparastî ji êrîşan re vekiriye û her tim bi tunebûnê re rûbirû ye.

Çawa ku çand bi hiş û hişmendiya kolektîf diafire, divê parastin jî wiha be. Çawa ku çand derbûna nasnameya neteweyekê ye, divê ew netewe li nasnameya xwe xwedî derbikeve, xwe ji hemû êrîşan biparêze. Çawa ku mirov bêyî nirxên civakbûnê nikare bijî divê mirov wan nirxan biparêze.

Îro li her bihost axa Kurdistanê qirkirineke çandî, fizîkî, siyasî û polîtîk heye. Civaka kurd bi hemû nirxên xwe di bin êrîşeke tunekirinê de ye. Bi taybetî di demên dawî de ev êrîş zêdetir bûne. Hin caran em dibînin ku axaftina zimanê kurdî qedexe dikin, hin caran jî huner û muzîka kurdî; li hin deveran xwezayê, li hin deveran nirxên pîroz û goristanan dişewitînin; li hin deveran dîrokê tune dikin, li hin deveran jî bermahiyên çandî. Mînakên vê yekê mirov dikare li pey hev rêz bike û yek bi yek jî bi nav bike. Ev qirkirin li hin deveran kûr û zirav dimeşe; li Dêrsimê bi her awayî ev nirxên civaka kurd tên tunekirin. Hemû pîrozî, bawerî û çanda civaka kurd a elewî ji holê tê rakirin. Ev qirkirina çandî di heman demê de qirkirina neteweyî ye. Ji bo pêşîgirtina vê qirkirina neteweyî pêwîstî bi yekîtî û tevgerîneke giştî ya neteweyî û civakî heye.

Heke em bêjin parastina çandê parasina civakê ye, wê demê yê ku çanda xwe neparêze, nikare civaka xwe jî biparêz e. Lewre parastin bixwe jî çandek e. Civakên çanda wan a parastinê pêşketî ye gengaz e ku bijîn lê yên parastina xwe nekin ne gengaz e ku dikaribin hebûna xwe berdewam bikin. Xweparastin reflekseke jixweber û bi hemû zindîwaran re pêşketî ye lê mixabin mirovên ku difikre, xwedî hiş û hişmendî ye carna ji ber gelek sedemên cihêreng xwe naparêzin.

# Xwendin nivîsê ji tarîtiyê rizgar dike

Felat Nishtiman

Girtin û desteserkirina sazî û şaredariyên kurdan ên li bakurê Kurdistanê, bandoreke pir dijwar a neyînî li kar û barên çand, ziman, wêje û hunera kurdî kir. Tenê ev nehat kirin, her wiha bi awayekî sîstematîk ji 2016'an vir ve bi taybetî li dijî zimanê kurdî polîtîkayeke bizext û zordarî di meriyetê de ye.

Tevî van pêkanînên çilmisandin û bişaftinê, xemxurên zimanê kurdî jî li gorî derfetên xwe alternatîfan diafirînin û li hemberî van polîtîkayan, li ser zimanê xwe dixebitin.

Koma Xwendinê ya Amedê jî yek ji wan xebatan e ku sala 2016'an ji aliyê çend kesan ve li Amedê hatiye avakirin.

Kom 15 rojan carekê dicive û li ser roman/çîrokeke kurdî şêwrê dike. Komê heta niha ji 60'î zêdetir şêwr kirine. Li gorî şert û mercan nivîskarên pirtûkên li ser wan şêwr tê kirin jî yan rasterast an jî bi awayê online beşdarî şêwrê dibin.

Yek ji endamên Koma Xwendinê ya Amedê Xecê Daşgin der barê şêwrên wan ên xwendinê de axivî. Daşgin diyar kir ku avakirina komê li Kurdistanê enerjiyeke baş çêkiriye ji hêla xwendina pirtûkên bi kurdî de û bi avakirina koma wan re, li gelek bajarên mîna Mêrdîn, Wan, Cizîr, Êlih, Mêrsîn û Stenbolê jî komên xwendinê hatine avakirin û heta astekê haya koman ji hev heye.

Daşgin da zanîn ku li cîhanê komên xwendinê ji zû ve hene, loma dereng be jî avakirina komên xwendinê ji bo nifşa vê serdemê hewcedariyek bûye û bi saya komê gelek kesên başdarî şêwrên komê bûne, piştre bala xwe bêhtir dane ser xwendina pirtûkên bi kurdî û jixwe yek ji armancên komê jî ev e.

Têkildarî pîvanên şêwrê Daşgin ragihand ku ew pirtûkan ji aliyê ziman, naverok, cure (roman, çîrok), teknîk û şêwaza berheman ve dinirxînin û wiha domand: "Dema em romanekê dinirxînin, pêşî em li rastnivîs û edîtoriya wê dinêrin. Di romanên kurmancî de pirsgirêkeke pir cidî ya edîtoriyê heye. Edîtor bixwe bi baldarî naxwîne. Wisa mezin e pirsgirêk, nivîskar bixwe di nav wê de difetisin. Li wan jî neheqî tê kirin. Mesela karakterê berhemê di serî de mamoste ye, 25 rûpel şûnde dibe endezyar. Divê edîtoriyeke baş bê kirin."

Daşgin rexne li zimanê pirtûkên wan xwendine kir ku bi taybetî gelek pirtûkên demên dawî bi mentiqa tirkî hatine nivîsîn û wiha pê de çû: "Pirî caran nivîskar jî vî tiştî qebûl dikin. Ev bi rewşa me ya zimên ve eleqedar e. Di dinyayê de nirxandineke wiha tune ye. Tu biçî berhemeke bi îngilîzî binirxînî, tu bi vî şiklî nanirxînî. Heger em tenê di zimên de bimînin, xwendin teknîkî dimîne, nagihîje astekê. Di şêwrên xwe yên dawî de em pir li ser vê nasekinin, çimkî kêm zêde di gelekan de heye. Em bêtir li ser neverok, mijara berhemê û şêwaza nivîskar disekinin."

Der barê sûda şêwrên komên xwendinê ya ji bo wêyeja kurdî de jî Daşgin da zanîn ku gelek kes di heman demê de berhemekê dixwînin û wê berhemê ji hemû aliyan ve dinirxînin û şîrove dikin. Her wiha Daşgin aşkera kir ku hin berhemên kurmancî qedera wan ew e, ji xeynî nivîskar kesek pir bi baldarî naxwîne û wiha got: "Çi şaşiyên rastnivîsê û yên mentiqî hene; di girêdana romanê de çi pirsgirêk hene, kom li ser hemûyan disekine. Xêra komê ya li wêjeya kurdî, li berheman ev e. Em berheman didin ber hev. Piştî gelek xwendin û nirxandinan hin pîvan di serê mirov de çêdibin."

Daşgin di berdawama axaftina xwe de desnîşan kir ku ji bo pêşketina wêjeyê xwendin bi qasî nivîsê girîng e û heger nivîs neyê xwendin ew nagihîje armanca xwe û hiwa domand: "Di kurmancan de xwendin carna di quncikê xwe de dimîne. Lê heger hatibe xwendin tu bizanibe nivîs ji tarîtiyê rizgar dibe. Heger neyê xwendin bi serê xwe tu hêza nivîsê tune ye. Bo vê jî xwendina kurdî pir biqîmet e. Xwendina her berhemê, dibe sedema çapeke nû. Di hemû civakan de wêje bi vî awayî geş bûye. Berhem gihîştiye ber destê mirovan, hatiye xwendin, şîrovekirin û careke din derketiye."

Herî dawî Daşgin da zanîn ku rizgariya wêjeyê bicihbûna çanda xwendinê ve girêdayî ye û bang li xwînerên kurdî kir ku werin beşdarî Koma Xwendinê ya Amedê bibin; pirtûkên bi kurdî bixwînin û şêwra xwe li ser wan bikin.



xwebûn

17-23 Tebax 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 35

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*
Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*
İdris Gürmez
*Yayın Danışma Kurulu:*
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 ***Yenişehir / Diyarbakır***
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Keleh û bircên Amedê

**M. Alî Ertaş**

Gelek cih û şûnwarên dîrokî li ser axa me hene. Dibe ku em di nav van şûnwaran de dijîn lê haya me ji dîroka piraniya wan çênabe. Lewre em ê hinekî behsa keleh û bircên Amedê bikin.

Amed, bi keleh û bircên xwe tê nasîn. Keleh zêdetirî 5 km dirêj e. Têketina kelehê ji çar deriyan ve pêk tê: deriyê Çiyê (deriyê Xarpêtê jî tê gotin), deriyê Rihayê, deriyê Mêrdîn û deriyê Nû. Temenê keleha Amedê digihêje 9 hezar salan. Piştî seda Çînê keleha herî dirêj a cîhanê ye. Keleh di sala 2015'an de jî ket Lîsteya Mîrateya Cîhanê ya UNESCO'yê. Keleh bi birc û kîtabeyên xwe bêhempa ye, ji jor ve dişibe masiyê mertalî. Keleha Amedê bi bircan xeml û xêza xwe neqişandiye û bajêr ji êrîşan parastiye.

Li ser kelehê di serdemên cuda de 82 birc hatine çêkirin. Gelek ji wan grover in; hin ji wan çarqozî û pirqozî ne; hin ji wan jî 2-3 qat in. Qatên jêr wekî embar hatine bikaranîn, qatên jor jî ji bo karên leşkerî. Bircên li hemberî êrîşan û xwezayê li ser lingan mane, gelek ji wan rastî texrîbatên mezin hatine. Her çiqas ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û wezareta çandê ve hinek ji wan hatibin restorekirin jî dîsa li benda rastorasyoneke nû ne.

Li ser gelek bircên Amedê çîrok hatine gotin. Bi çîrok û serpêhatiyên xwe di nav rûpelên dîrokê de hatine parastin. Di nav 82 bircan de yên herî zêde tên naskirin, birca Bilind ango birca Ben û Sen, birca 7 Birayan, birca Keçikan, birca Merwanî, birca Keça Qral û birca Tupişkê tên naskirin.

### Birca Ben û Senê

Birca Ben û Senê li newala çemê Dîcleyê dinêre. Parastina wê hêsan e. Birc 4 qozî ye. Bircên dora wê dûrî hev in. Li gorî kîtabeyan Artûkiyan ew çêkiriye. Di navbera salên 1183- 1232'yan de, di dema Melik-el Salîh ebû'l-feth Mahmût ve hatiye çêkirin. Mîmarê wê Cafer kurê Brahîm e. Li ser bircê bi tevahî 6 motîfên şêran hene. Motîfên şêran bi tac û bask in. Teriya şêran wekî serê ejderha hatiye çêkirin. Serên şêran, mîna serê mirovan in. Ev fîgurên şêran, fîgurên şêrên li pêş pîramîtên Misrê tîne hişê mirovan. Li aliyê din, li ser vê bircê qertelê duserî heye. Di baskê vî qertelê duserî de 6 per dirêj dibin. Gelek motîfên şêr û qertelan xurimîne û şikestine. Ji ber ku qertelê duserî pir hatiye hezkirin, li gelek sazî û rêxistinên wekî Şaredariya Amedê, Zanîngeha Dîcleyê û gelek saziyên din wekî sembol bi kar anîne.

### Birca 7 Birayan

Li aliyê başûrê keleha Amedê hatiye çêkirin. Ev birc jî wekî birca Ben û Senê, di sala 1183-1232'yan de ji aliyê Artûkiyan ve hatiye çêkirin. Ji bo hikumranê Artûkiyan Melîk Salîh ji hêla mîmar kurê Cafer ve hatiye çêkirin. Ev birca grover, bi bilindî û mezinbûna xwe bi heybet e. Li ser vê bircê fîgurê qertelê duserî, şêrê bi bask û sewalên din hatine çêkirin. Kîtabeya li ser sînga vê bircê hatiye nivîsin, wekî bazinekî nexşandî yê gerdenê ye. Mirov li hemberî xeml û xêza wê matmayî dimîne. Ev birc jî wekî birca Bilind ji binî heta jor, bi awayekî estetîk bi aheng hatiye neqişandin. Ji kîtebeya ku wekî gerdenekê pêçaye heta fîgurên heywanan rengê huner û hostatiyek mezin tê xuyakirin. Ev kîtabeya kalîgrafîk ku bircê dike du perçe; li ser kevirên fireh wekî tenteneya bi moriyan hatiye xemilandin. Dîsa li ser vê bircê jî fîgurên şêrê bi bask û sermirov ku teriya wî serê ejderha ye hatiye bicihkirin. Ev fîgurê şêr ê li çep û rastê wechê bircê hatine çêkirin, li binya bazinê kîtabeyê hatine bicihkirin. Dîsa li binya bazinê kîtabeyê û orta her du şêran fîgurê qertelê duserî hatiye çêkirin. Di van nexşe û fîgurên hatine çêkirin de, tê xuyakirin ku wê demê gelek qîmet dane huner û çandê. Her wiha hatiye xwestin ku bi van fîgur û nexşeyan mezinbûn û hêza şaristaniyên xwe nişanî cîhanê bidin.

Li gorî tê gotin, rojeke ji rojan, qralê wê demê pêşbirkekê saz dike. Qral, dixwaze du bircên pir bilind û xweşik bên çêkirin. Li ser daxwaza qral, hosta û şagirtek xwe pêşniyar dikin. Hosta bi vê pêşbirkê dixwaze hunera xwe nîşanî cîhanê bide. Şagirt jî dixwaze bi vê derfeta ku ketiye destê wî ji hostayê xwe derbas bike. Piştî demekê hosta birca 7 Birayan, şagirt jî birca Bilind çêdikin. Bi çêkirina van bircên bilhtîşam hem qral gelekî kêfxweş dibe, hem jî hoste û şagirtê xwe bi berhemên xwe serbilind dibin.

Li gorî rîwayeteke din, rojek ji rojan dijmin dora bajêr dorpêç dike. Piştî şerê roj û mehan, dijmin hemû bajêr dagir dike lê tenê birca 7 Birayan bidest naxe. Qralê dijmin ji bo lihevhatinê nameyekê ji 7 birayan re dişîne. Dixwaze 7 birayan teslîm bigire. 7 bira jî şert û mercên teslîmbûna xwe ji qral re radigihînin. 7 bira dixwazin qral bi xwe were wan teslîm birige. Li ser vê daxwaza 7 birayan, qral daxwaza wan qebûl dike û li gel fermandarê xwe diçe birca 7 Birayan.

Piştî qral û fermandarên xwe dikevin hundirê bircê teqîn çêdibe. 7 bira depoya tije barûd diteqînin. Bi vê teqînê qral û fermandarên wî û 7 bira bi hev re dimirin. Bi vê yekê bajar jî rizgar dibe.

### Birca Keçikan

Birc di serdema Hûrriyan de li rojhilatê deriyê Mêrdînê hatiye çêkirin. Beriya zayînê (B.Z) sala 349'an ji aliyê împaratorê Romayê Konstandinos ve û sala 1223'an jî ji aliyê Merwaniyan ve hatiye restorekirin.

Di nav bircan de birca herî kevn û mezin e. Ev birca ku ji 11 kemeran pêk tê, wekî perestgeh jî hatiye bikaranîn. Tê gotin ku serdepa di bin vê bircê re derbasî derveyî kelehê dibe lê bi betonê hatiye girtin. Herî dawî sala 2002'an wezareta çandê ew ji nû ve restore kir û ji bo geşt û guzariyê hat vekirin.

### Birca Nûrê

Ev birc li rex birca 7 Birayan, di navbera salên 1085-1183'an de, serdema Selçûqiyan, ji aliyê mîmar Selamî kurê Muhamedê Rihayî ve hatiye çêkirin. Kîtabeya li ser vê bircê bi nivîsa Kûfî (Nebatî) hatiye nivîsîn. Li ser dîwarên vê bircê, sûretên hesp, şêr, xezal û fîgurên jinê hatine nexşandin. Bi nivîs û fîgurên sewalan birca herî xweşik û dewlemend e. Di navbera kîtabeyê de bizina qiloçdirêj, ahenga bircê xweşiktir dike. Dîsa hespê ku bi çargaviyan dibeze yê di nav kîtabeyê de bi cih kirine, pêşketina peykersaziyê û di aliyê anatomiyê de çavderiyên xurt nîşan dide. Fîgura kevokê ku li çepê kîtabeyê hatiye çêkirin wekî baskê qertelê duserî 6 per jê diherin. Li biniya vê kîtabeyê peykerê jinek tazî, porkinik ku çarmêrkî rûniştiye heye. Li aliyê rastê dîsa motîfê kevokê û li biniya kevokê jî peykerê jina tazî cih digire. Di serdema antîk de peykerên jinên tazî yên wekî Kîbele, sembola bereket û zêdahiyê ye. Li aliyê rastê yê kîtabeyê peykerê şêr hîn berbiçav e. Li milê çepê peykerê çûkekî goştxwir ku cureyê wî nayê zanîn heye. Di vî peykerê çûkî yê seyda xwe parçe kiriye, hêz û xurtbûnê nîşan dide.



### Birca Deriyê Çiyê

Hemû şaristanî û hikumdarên ku serwerî li Amedê kirine, li ser dîwarê birca Deriyê Çiyê kîtabe û sembolên xwe nexşandine. Li gelek cihan fîgur û peykerên sewal û gihayên cur bi cur çêkirine. Ji aliyê kîtabe û nexşeyan ve birca herî dewlemend e.

### Kîtabe û fîgur

Dema mirov li tablet û nivîsên birc û keleha Amedê dinêre, dibîne ku hemû çand û keda mirovahiyê li vir li hev civiyane. Her civakekê bi tablet, nivîs û fîgurên xwe kevneşopiyek li pey xwe hiştiye.

Lê belê ji ber birc û keleh gelek caran hatiye hilweşandin û nûkirin, gelek ji van tablet û nivîsên ku çand û dîroka van civakan gihandiye heta roja îro wenda bûne. Tablet, bi piranî ji fikir û nerînên hostayên ku birc û keleh lêkirine pêk tên.

Fîgur jî sembolên bawerî û çanda civakên wê serdemê pênase dikin. Fîgur û tabletên Roma û Bîzansiyan bi piranî li deriyê Mêrdînê hene. Li gorî lêkolînan di nav yek ji van tabletan de wiha tê nivîsîn: "Împaratoriya ku têk naçe, bi pêşengî û rêveberiya leheng Velantitianus û Grantianus di bingeha dewletbûnê de hat avakirin."

Hin nivîs û tabletên dema Abasiyan jî di navbera deriyê Mêrdînê û deriyê Çiyê de hene.

Di van nivîsan de jî navên kesên endezyarî li ser vê axê kirine tê nivîsîn.

Di serdema Merwaniyan de Amed tê nûkirin. Merwanî bi piranî li ser avakirina birc, bend û piran rawestiyane. Di vê demê de welatiyên vir di nav aramiyê de jiyane. Vê demê Amed dibe mesken û warê zanist, zanyar, endezyarî û çandê. Mirov li ser bircan û kelehê, li gelek nivîsên Mervaniyan rast tê.

Mescîda Mervaniyan a li deriyê Çiyê ye yek ji wan e, îro roj wekî Galeriya Hunerê xizmetê dide. Nivîsa li hundirê derî hatiye nivîsîn wiha ye: "Mescîda xwedê tenê ji aliyê kesên nimêj dikin, rojî digirin, zekatê didin û kesên ji xwedê ditirsin ve tê tijekirin."

Tableta ku di serdema Selçûqiyan de li ser birca Nûr û Findiqê hatiye nivîsîn wiha ye: "Siltanê mezin, şahê şahan, siltanê welatê xwedê; mezinê ol, welat û cîhanê; kurê Alparslan Melîkşah, emir kiriye ku ji malê xwe çêke."

Di serdema Eyyûbiyan de keleh seranser ji nû ve tê nûkirin. Li ser bircên dora deriyê Çiyê tabletên Eyûbiyan zêde hene. Di yek ji van tabletan de wiha tê nivîsîn: "Bila xwediyê mezinahiyê siltan Melîk kurê Kamîl, şahê mislimanan û îslamê, stêrka cîhanê Ebu'l-fet Eyuup Melîk Salîh siltan Ezîz be."

Gelek fîgurên li ser bircan û keleha Amedê hatine nivîsîn, li benda lêkolîn û vegotina zanistî ne. Ev fîgurên sembolîk, çand û baweriyên gelek serdeman nîşan didin. Di van fîgurên li ser van bircan hatine nexşandin, şopên çand û baweriyên şaristaniyên di dîrokê de hatine li vir jiyane hene.

